



*Kongreya 6. a MXDŞ'ê kongreya guhertin
û
veguhertinê bû*

Xweza û Wate, Dîyalektîka Xwezayê

Çima Niha dema jinê ye

Pêşeroja Êzdiyan di Entegrasyona Demokratîk de





Nav	İbrahim Derwêş
Navê Dayîkê	Êma Murad
Navê Bab	Derwêş
ji dayîk bûn	01- 05 - 1978
Şehîd bûn	15 - 6 - 2023
Cihê Şehîd bûnê	Li meclisa sinûnê

دیکلہ DICLE



DICLE

Lêkolîn, belge û Lêgerîn

Sal-10-Hejmar-40

2026-Gûlan-Hezîran

DESTEYA WEŞANE

- OSMAN ÇELİK
- HINARE TAJDIN
- RUKEN EHMED
- AYSEL AVESTA AYDIN
- XERIB HISO
- QASIM KEŞKO
- AYHAN ERKMEN
- EVIN ŞİNGALİ

NAVNIŞAN

ŞİNGAL * SİNCAR



E. mail: Diclepres@gmail.com
Diclekovar@gmail.com
<https://kovaradicle.com>

Tel : 07871183609

04

EDITOR

06

XWEZA Û WATE
Diyalektîka Xwezayê

Fikrên Azad

11

Hevpeymanana Nû ya Meclîsa Gel
a Şengalê
Ji belgeyên 6.Kongreya MXDŞ'ê

Dosye

18

Kongreya MXDŞ'ê.6
kongreya guhertin û
veguhertinê bû

Hevpeyvîn

29

Pêşeroja Êzdiyan di Entegrasyona
Demokratîk de

civak

32

Kobanê

Helbest

Ciwan

33

Çima "Niha dema jinê?"
ye

Jin

Tenduristî

41

Dîroka Gundê Barê

çand

45

Werziş rêbazekî parastina
cewherî ye

47

Êrîşa li ser Meclîsa Gel a
Sinûnê

Portre

50

Virûsên Herî Girîng

EDÎTOR

Merheba xwendevanên hêja yên kovara Dîcle! Piştî du mehan em carek din li pêşberî we ne. Wek tê zanîn di her du mehan derbasbûyî de li Rojhilata Navîn û li cîhanê geşedan û pêşketinên ku rûdan, wisa ne ji rêzê bûn. Bûyer ewqas bi lez bi pêş dikevin ne bi mehan, lê heftane, rojane û bi seatan gûhertin çêdibin, wisa lê hatiyê tişta ku dûh bûye weke deh sal berê çêbûye.

ABD û Îran dijminên hevdû yên salan e ku li hemberî hev xwe bi hêza xwe dinepixin. Di dawî de rastiya xwe danîn holê û bi şerekî bê pîvan bi serhevde çûn. Lê heta niha ya ku xuya dike di vî şerî de aliyekî ku bi temamî serkeftî be nîne û aliyek ku bi temamî binketî be jî xuya nake, ev hevdû qirkirina hêzên hegemon a şerê sermayedaran wê çawa bi encam bibe ne diyar e. Lê ya diyar ev e, di xwe ceribandina her du hezan de mixabin dîsa êş, azar û windahiyên van şeran li ser dilê civakan tê meşandin, mîrateya ku ji wan re dimîne bermahiyên wêraniyê ne. Ji ber kûrbûn û neçareserkirina qeyranên heyî, hema bêje cîhan hemû ketiye derdê xwê parastinê, ji ber êdî ji ewlehiya xwe bê bawer in ditirsin jî ku, bi çî sedemê, çî bi serê kê were nediyar e.

Mijarên me yên vê hejmarê jî ji vê rojevê ne qut in. Gelê Şengalê jî li hemberî gefên li ser xwe, bi parçeyek axa xwe lê bi dilê xwe yê mezin, ji bo ji nûve avakirina civakek ehlaqî û polîtîk di nav tevger û hewldanan de ye. Ji milekî ve ji bo ewlehiya xwe xebatan dide meşandin, li milekî di nav hewldanên avakirina yekîtiya Êzîdiyan de ye, ji milekî ve kongreyên xwe li dar dixê, bi sazî û rêveberiyên xwe di nav guhertin û veguhertinê re derbas dibe, ji bo civakek yekgirtî û xurttir zend û bendên xwe badaye.

Bi vî awayî kovara me jî vê carê bi van mijaran derdikeve pêşberî we. Ji Manîfestoya Civaka Demokratîk a Rêber Apo nivîsa bi sernavê xweza û wate cih digire ku di vê nivîsê de nirxandinên li ser heqîqeta gerdûnê, cîh û zeman, mirov û xweza bi kûrahî hatine destgirtin.

Dîsa pêngava KJK'ê ku bi navê 'Dema Jinê ye' daye destpêkirin, ji aliyê Endama Koordînasyona KJK'ê Çîgdem Dogu ve ji hemû milan ve hatiye nirxandin. Li hemû derên cîhanê rewşa ku jin pê re rû bi rû ne, pirsgirêkên wan û divê têkoşîna wan çawa be di vê hevpeyvînê de bi berfirehî hatine nirxandin.

Rêveberiya Xweser a Şengalê 7'emîn kongreya xwe ya asayî lidarxist ku di vê kongrê de hevpeymanî civakî hate nûkirin ku wê ji niha û pê ve bi navê Meclîsa Gel a Şengalê xebat were meşandin. Girêdayî vê kongrê, bi hevserokên Meclîsa Gel a Şengalê re hevpeyvîneke berfireh hatiye kirin. Dîsa me di vê hejmara xwe de cih daye belge û hevpeymanîya nû ya Meclîsa Gel a Şengalê jî.

Dîsa ji pênuşa rojnamevan Îbrahîm Êzîdî, du sernivîsên cuda di kovarê de cih digirin, yek ji wan li ser dîroka gundê Barê ya Şengalê ye ya din jî li ser entegrasyona demokratîk û yekîtiya Êzîdîyan de ye.

Em bi zaravayê soranî beşek ji pirtûka Mam Zekî Şengalî, di vê hejmarê de jî diweşînin.



Rêber Apo

Xweza Û Wate Dîyalektîka Xwezayê

Wate beriya her tiştî hebûnekê ferz dike. Derveyî hebûnê mirov nikare behsa wateyekê bike. Û em xwezayê di ser sêwirandinên xwe yên zêhnî re nas dikin. Ev sêwirandinên me ji çavdêrî û ceribandînan me yên li hawirdora me tê û xwe dispêre hêza ramanê.

Wateya xwezayê ji diyalektîka wê tê. Em ji însan dest pê bikin. Pêwendîya însan-wateyê di sêbjebûna wê de veşartîye. Sêbjebûna di însan de fikra “ez” bi têgînên weke Nîrvana, Geîst, Ruh, Fenafîllah, Enel Heq ji bo heman fonksiyonê hatine bikaranîn. Têgîneke ekonomîk ya bi navê qatjimêra Gînî heye. Nirxekî di navbera ‘0’ û ‘1’ê de ye. Wexta tê ber bi ‘0’ (sifir) ve wekheviya teqez, wexta ber bi ‘1’ê ve diçe newekheviya teqez. Teqezî ne di ‘0’ê de ne jî di ‘1’ê de ye. Ango teqezî ne di wekheviyê de dibe, ne jî di newekheviyê de. Neteweyek di yek kesî de nabe; ne mimkûn e. Wekheviya teqez ango wekheviya teqez a hemû hemwelatîyan jî ne mimkûn e. ‘1’ têgîneke ferazî ye. Wateya teqez an jî geîsta teqez an

jî bêwateya teqez dikare bê fikirîn lê pêk nayê. Têgîna ‘0’ û ‘1’ jî vêya rave dike. Tiştê ku em ji vê derê fêhm bikin bi ‘ez’ re eleqedar e yan jî rewşeke bi ‘sêbje’ re eleqedar e.



Di dinyaya nebatan de, di dinyaya fizîkê de heta di dinyaya kîmyayê de lêgerîna wateya kûrbûnê yan jî lêgerîna zindîbûnê jî dibe ku hebe. Fikirandina vê mimkûn e, lê wexta ber bi ‘ez’ ve tê, ber bi însan ve tê zoriya wateyê derdikeve holê. Di yekê de, di ferd de, di sûbjeyê de tekbûna Gerdûnê çiqasî rast e? Mînak ji mêjvebûna ango bêdawîbûna di zeman de û di mekan de; belê têngîna bêdawîbûnê heye, lê di encamê de tiştêkî bi navê zeman û mekan jî heye. Zemanê sifrê, mekanê sifrê; vaye Bîg Bang têngîneke wisa ye. Di noqtaya ku zeman û mekan tine dibe de Bîg Bang çêdibe. Yek jî bêdawîbûn heye. Ji mêjvebûna zeman, bêdawîbûna mekan; em dikarin vana jî bifikirin. Di dinyaya heyî de, di gerdûna heyî de evana wateyekê îfade dikin. Eynî weke teqezîya ‘0’, teqezîya ‘1’ê. Heye lê ti tiştî îfade nake. Nayê fêmkirin, wekheviya teqez jî newekheviya teqez jî tiştên ku beranberiya wê nîne.

Me ji mîtolojiyê fêmkirin; di mijara sûbjeyê de tê xuyakirin ku bi vî şewazê fikirandinê nagihîje cihekî. Ji bo bûyera sûbjeyê me got dibe ku ol hin tiştan dibêje, lê ol çî ye kê-m-zêde dahûrandina wê hatiye kirin. Lê felsefe hîna jî bi çareserkirina van pirsan re rûbirû ye. Zanist xwe dispêre pîvanê. Wexta zanist tê gotin pîvan, matematîk tê hişê mirov. Çî tiştê ku tu bipîvî zanist e. Lê ev jî her tiştî îfade nake. Lewra zemanekî ku nayê pîvandin heye, wêdetirbûna zeman; mekanekî ku nayê pîvandin heye, wêdetirbûna mekân. Vaye di navbera vê de fikra spekulatîf ku em jê re dibêjin metafîzîk tê. Xeyal, bawerî, bawerkirin. Di tiştên ku tê pîvandin de ango di zanistê de heye. Li kêleka van hest



Di noqtaya ku zeman û mekan tine dibe de Bîg Bang çêdibe. Yek jî bêdawîbûn heye. Ji mêjvebûna zeman, bêdawîbûna mekan; em dikarin vana jî bifikirin. Di dinyaya heyî de, di gerdûna heyî de evana wateyekê îfade dikin. Eynî weke teqezîya ‘0’, teqezîya ‘1’ê. Heye lê ti tiştî îfade nake. Nayê fêmkirin, wekheviya teqez jî newekheviya teqez jî tiştên ku beranberiya wê nîne

Zindîbûn mirinê ferz dike, mirin zindîbûnê ferz dike. Ev her du jî mimkûn in, hem zindî hem mirî; cihê ku mirin lê heye ew ê zindî, cihê zindî lê heye ew ê mirin hebe. Tiştêkî ne ku zêde nayê fêmkirin jî. Di gerdûnê de her tiştê ku dibe û diqede li gorî vê rêgezê pêk tê

hene, çavderî hene. Evana hemû dikarin di nav metafîzîkê de bîn bicihkirin. Û evana însan dike; evana di ferdê însan de pêk tên.

Bûyera ku em jê re dibêjin sûbje, ji Descartes ve bûye têngîneke sereke. Li cem Fransewîyan bi şoreşê re pêşketîneke mezin çêbûye. Sûbjeya ferd, sûbjeya neteweyî, sûbjeyên ekonomîk pêşketîneke mezin bi dest dixê, hem jî ji her hêlê ve. Di hunerê de jî sûbjebûn pêş dikeve. Beriya vê jî heye, niha ji Descartes vir de mijara sereke ya felsefeyê ye. Heta di zanista civakê de wisa ye. Jixwe netewe dewlet sûbjeyek e. Sûbjebûn di heman demê de têngîneke wate lê barkirî ye. Sûbjektîvîte beşa wê ya wateyê ye, objebûn beşa wê ya madde ye. Wateya yê

dîtir di objeyê de dibe sûbje. Cudahiya sûbje-objeyê dibe cudahiyeke Descarteswarî. Lê divê em behsa tiştêkî hîn gelemperî bikin. Weke sûbje însan an jî weke wate însan rast e yan jî ji wê wêdetir, gerdûn rast e? Divê kîjan sereke bê destgirtin?

Li gorî min noqteya ku felsefe tê û xwe dispêrê ev der e. Vaye di vê derê de cudahiya binavûdeng “îdealîzma teqez” an jî “materyalîzma teqez” derdikeve pêşberî me. Her tişt ji fikra însan ve pêk tê, nexwe fikra însan teyasindeke hêsan a dîtir e? Ev hêj nehatiye çareserkirin. Bênavber ji vê pirsê re li bersivan digerin. Em hê jî şênber bikin; serwextbûna însan ma gerdûnê mimkûn dike; nexwe gerdûn serwextbû-



na însan e? Pirsgirêk di vê derê de ye. Em ji gihîştina darazeke teqez dûr in. Xeyala gerdûnên cuda, fikra gerdûnên cuda derdikeve hole, gerdûnên ku em dizanin û em dibînin, gerdûnên xeyalî, gerdûnên çêkirî ji aliyê Jean Baudrillard ve teoriya Sîmulakr hatiye pêşxistin, behsa sîmûlasyonan dike. Dibêje “her tişt ji sîmûlakran pêk tê”. Tiştta ku zanist li pey ketiye pîvan e. Ji beriya 13.8 milyar salan, ji Big Bangê tîne heta roja me ya îro. Tê fêmkirin ku rewş qet jî ne wisa ye. Teoriya Big Bangê bi hilweşînê re rûbirû ye. Vaye gerdûnên cuda, sîmulakr, mejiyê çêkirî... Tu yê ji çi bawer bikî?

Taybetmendiya sereke ya vê rêgezê çi ye? Tu leza diyardeyekê bi misogerî bizanibî pozisyona wê tu nizanî; tu pozisyona wê bizanibî tu leza wê nizanî. Tu ti carî nagihîjî agahiya teqez. Qasî ku tu bizanibî nediyarî çêdibe. Nediyarî nebe zanîna wê çênabe. Tu tiştêkî bizanibî, teqez tu tiştêkî jî nizanî. Ango cihê ku agahî lê heye nezanîn jî lê heye. Agahiya teqez ew ê nediyarî be. Ez jî ji vê bawer dikim. Zindîbûna teqez, fanîtiya teqez nabe. Evana hemû îzafî yan jî hemû nediyar in. Vaye formûla binavûdeng a pisîka Schrodînger. Pisîka di qûtiyê de zindî ye, mirî ye? Hem zindî hem mirî ye. Di rastiyê de ev jî rast e. Zindîbûn mirinê ferz dike, mirin zindîbûnê ferz dike. Ev her du jî mimkûn in, hem zindî hem mirî; cihê ku mirin lê heye ew ê zindî, cihê zindî lê heye ew ê mirin hebe. Tiştêkî ne ku zêde nayê fêmkirin jî. Di gerdûnê de her tiştê ku dibe û diqede li gorî vê rêgezê pêk tê.

Wate encax bêwatebûn hebe mimkûn e. Li cihê ku bêwatebûn lê nebe wate nabe. Wate li gorî bêwatebûnê tê pîvandî. Pirs-



girêka Kurd jî wisa ye. Eger di pirsgirêka Kurd de bêwatebûnek nebûya, ma me dikarîbû wateyek mezin a wisa hilberand? Ji ber ku bêwatebûnek pir mezin, nixumandinek, nediyariyek hebû me wateyek mezin hilberand. Perdeya vê me çirand. Ez sêbjeya vê me. Rastiya Apo çi ye? Kesayetê ku xêliya Kurd çirandiye. Weke dîrokî û rojaneyî me neşter li hemû nediyariyan xistiye. Teqîneke wateyê derket holê. Niha em tam rewşa teqînekê dijîn.

Ferqa min ev e; min ev hîs kiriye. Ev hîskirin min veguherandiye hewldanekê. Ango meraq... ji bo derbasikirina vê meraqê perdeyên li ser diyardeya Kurdistanê me hêdî hêdî çirandiye. Îro deryayek wateyê derket holê. Diyardeyên din jî kê-m-zêde wisa ne.

Fikra atomê di serdema pêşîn de destpêkê weke têgîneke hêsan, razber derdikeve holê. Îro jiyana bê atom ne mimkûn e. Za-

nista atomê nebe amûrên teknîkî (ji radyo, TV'yê bigire heta kompîturê) yên em bi kar tînin ew ê nebûya. Hemû xwe dispêrin zanista atomê. Lê zanista atomê di serdemâ pêşîn de têgîneke razber bû, nediyar bû. Ev nediyarî hat tehlîlkirin, îro bûye hêmana herî girîng a jîyanê. Mijarên din jî weke vê ne. Em bi wateyê dewam bikin.

Em wateyê di Hegel de, diyalektîkê di Engels de dibînin. Xweza û wate, bi gotineke din diyalektîka xwezayê weke “ez” û “yê dîtir” digihîje îfadeyê. Tenê tegîna “ez” jî bi tena serê xwe têgîneke ku felsefe hê jî hewl dide îfade bike ye. Têgîna “yê dîtir” jî bi tena serê xwe ekoleke felsefî ye. Têgîna ez û yê dîtir taybet bi piranî têgînîkirinên Fransî ne. Xweza û wate têgînên kilîda felsefeya Hegel in. Dibêje “Fenomenolojiya ruhî”, heta ev berhama wî ya destpêkê ye. Ya rast weke xweza û wate jî dikare bê wergerkirin an jî bê şîrovekirin. “Diyalektîka xwezayê” jî navê berhema ku Engels nivîsî ye. Her du jî bi eslê xwe ji îdeolojiya Alman in.

Rastiya Apo çi ye? Kesayetek ku xêliya Kurd çirandiyê. Weke dîrokî û rojaneyî me neşter li hemû nediyariyan xistiye. Teqîneke wateyê derket holê. Niha em tam rewşa teqînekê dijîn

Têgînên felsefî ez û yê dîtir di çarçoveya îdeolojiya Fransî de ne. Tabî pênasekirina wan girîng e. Alîkariya ku em li vê derê bikin weke xwe dispêre zanistê çi derheqê xwezayê de, çi derheqê diyalektîkê de em ê şîroveyeke çawa pêş bixin. Lewra di navberê de herî kêm nêzî du sedsal derbas bûne. Di vê mijarê de mesafeyek zanistî ya mezin çêbûye. Yek, teoriya îzafiyetê heye. Teoriya kuantûmê heye. Û di biyolojiyê de, di kîmyayê de veguherîneke zanistî ya mezin heye. Tabî di heman demê



de ji aliyê zanista civakî ve mesafeyek mûezam a mezin çêbûye. Em evana komî ser hev bikin; xweza û wate, ango fenomenolojiya ruhî hêjî rojanebûna xwe diparêze. Hegel ne fîlozofekî wisa ye ku di rabirdûyê de maye.

Hevpeymanana Nû ya Meclîsa Gel a Şengalê Ji belgeyên 6.kongra MXDŞ ê

Di 6. Kongreya MXDŞ'ê de ku Hevpeymanana Civakî jî hate nûkirin, Meclîsa Gel a Şengalê weke pergala jiyana Civakî û siyasî ya Gel û komên baweriyê yên Şengalê tê tarîfkirin. Li gorî Hevpeymanana Civakî ya nû, wê pergala Civakî li ser esasê komînan ava bibe û hemû xebatên komînan di bin sîwana Meclîsa Gel a Şengalê de kombibin, Meclîsa Gel a Şengalê temsîla îradeya hemû civaka Êzidî û gelên Şengalê bike. Her wiha mijara entegrasyona demokratîk, beşeke girîng a Hevpeymanana Civakî ya nû ye. Di hevpeymanê de têkiliyên Şengal û dewleta Iraqê li ser esasê yekîtiya demokratîk tê tarîfkirin û bang li Iraqê tê kirin da ku di çarçoveya Destûra Bingehîn a Iraqê de, di serî de xwe rêveberin û xwe parastin, hemû mafên bingehîn ên civaka Êzidî werin qebûlkirin, Meclîsa Gel a Şengalê weke mînakek demokrasî û rêveberiya herêmî were naskirin

Çend xalên esasî ji Hevpeymanana Civakî

Di destpêka hevpeymanê de şerê li Rojhilata Navîn, pirsgirêk û nakokiyên ku pergala netewew-dewletê li herêmê pêşxistine, êrişên ku gihîştine asta qirkirinê tê nirxandin û wiha tê gotin: "Rojhilata Navîn her çiqas îro bûye qada şer a dewletan jî, di rastiya xwe de cih û warê çand û baweriyên qedîm ê pêkvejiyanê ye. Bi taybet pergala netewew-dewlet a ku bi destê kapîtalîzmê li Rojhilata Navîn hate ferzkirin, pirsgirêkên civakî, siyasî, çandî û aborî yên herêmê girantir kir. Ferman û talanên li ser gelên bindest, bîr û baweriyên qedîm bi êrişên kapîtalîzmê re gihîşt asta jenosîdê. Pergala netewew-dewlet ku reng û dengen cûda qebûl nake, di cewherê xwe de pergala qirkirina gelan e û ev pergal bû sedem bi dehan komên çandî û baweriyê werin qirkirin

'Şengal mifteya çareseriya Mûsil û Iraqê ye'

Hebûna gel, ol û çandên cuda yên Deşta Nînowayê ku Şengal jî parçeyek jê ye, di hevpeymanê de dibe mijara nirxandinê û giringiya Şengalê û Deşta Nînowayê wiha tê destnîşankirin: "Mesîhî, Şebek, Êzidî, Kurd, Tirkmen, Ereb, Keldanî, Suryanî jî di nav de gel û baweriyên herî qedîm ên li Iraqê, Deşta Nînowayê ji xwe re kirine qada jiyane. Ji ber vê, di fermana 2014'an de DAIŞ'ê êrişê vê herêmê kir, DAIŞ'ê baş dizanibû ku mifteya Iraqê Nînowa ye, mifteya Nînowayê jî Şengal e. Ji ber vê rastiye, parastina Şengalê di rastiya xwe de parastina Mûsilê ye, parastina Iraqê ye. Di fermana 2014'an de e ger ne ji berxwedana Şengalê bûna ne Mûsil mabû ne jî Iraq. Lewma Şengal mifteya Mûsilê, deriyê çareseriya krîza Iraqê ye

parastina Şengalê di rastiya xwe de parastina Mûsilê ye, parastina Iraqê ye. Di fermana 2014'an de e ger ne ji berxwedana Şengalê bûna ne Mûsil mabû ne jî Iraq. Lewma Şengal mifteya Mûsilê, deriyê çareserîya krîza Iraqê ye

Rêveberîya Xweser a Şengalê, bersiva fermana 2014'an bû

Di destpêka hevpeymanê de tê ziman ku civaka Êzîdî weke çand û bawerîya herî qedîm a dîrokê, ji ber bîr û bawerîya xwe herdem rastî komkujî, êriş û talanan hatiye û avakirina sîstema Rêveberîya Xweser wiha hatiye nirxandin: "Civaka Êzîdî, di nav rojên giran ên fermana 2014'an de hêzên xwe yê parastinê ava kirin, bi piştgiriya hêzên azadiyê li ber fermanê sekinîn û bi berdêlên giran Şengal rizgar kirin. Şengal bi îrade û bawerîya civaka Êzîdî hate parastin û azadkirin. Piştî rizgarkirina Şengalê, ji bo ji nû ve avakirina jiyana xwe sazî û dezgehên xwe birêxistin kirin, bi hêza xwe ya cewherî hemû pirsgirêkên xwe çareser kirin. Ev îrade û berxwedan ne tenê rê li ber rizgariya Şengalê vekir, her wiha Iraqê jî parast. Rêveberîya Xweser a Şengalê li ser vê rastiye, bi kedeke mezin û berdêlên giran ava bû

Rêveberîya herêmî ji bo yekîtiya Iraqê ne gef e

Di hevpeymanê de Meclîsa Gel a Şengalê weke pergala parastina hebûna civaka Êzîdî û hemû pêkhateyên Şengalê tê tarîfkirin û li ser giringiya pêşxistina rêveberiyên herêmî wiha tê gotin: "Di roja me de li gelek deverên cîhanê herêmên xweser, mînakên rêveberiyên xwecihî hene. Bi taybet ji bo komên çandî û baweriyê, rêveberiyên xwecihî bûye mifteya parastina hebûna wan. Her ku diçe baştir tê famkirin rêveberiyên herêmî, demokrasiya xwecihî ji bo yekîtiya dewletan jî ne gefe, ev rastî ji bo dewleta Iraqê û Şengalê jî derbasdar e. Destûra Bingehîn a Iraqê bi yasayên xwe ji bo komên çandî û baweriyê rê li ber rêveberiyên herêmî vedike, Eger Iraq li gor destûra xwe tevbigere, rastiya Şengalê û îradeya civaka Êzîdî nas bike, wê Rêveberîya Xwecihî ya Şengalê bibe mînakeke baş a demokrasî û azadiyê

Civaka demokratîk, netewa demokratîk û jiyana komînal

Meclîsa Gel a Şengalê, di Hevpeymanana Civakî de weke hêza xwerêvebirina hemû pêkhatayên Şengalê tê tarîfkirin û fikr û hişmendiya ku xwe dispêre wiha tê nirxandin: “Meclîsa Gel a Şengalê wekhevî û azadiya hemû gel, çand, bîr û baweriyên ji xwe re esas digire, pergala xwe bi hemû pêkhatayên Şengalê re ava dike, diparêze û rêvedibe. Xwe dispêre hişmendiya civaka demokratîk û fikrê netewa demokratîk. Li ser vê esasê, di nav hemû şax û qadên civakî de jiyana komînal esas digire û ji bo vê di hemû qadên jiyane de komînan birêxistin dike. Jiyanek û civakek demokratîk, komînal û wekhev ji bo xwe heyatî dibîne û ji bo pêşxistina nirxên civaka demokratîk û azadiya jinê têkoşinê dike

Divê Iraq îradeya Meclîsa Gel a Şengalê nas bike

Hevpeymanana Civakî her wiha bang li dewleta Iraqê dike ku di çarçoveya entegrasyona demokratîk de mafên Civaka Êzidî bê naskirin û wiha tê gotin: “Meclîsa Gel a Şengalê divê li ser esasê yasayên Iraqê were qebûlkirin. Weke rêveberiya cewherî ya Şengalê, wê ji parastinê heya aboriyê îradeya rêvebirina Şengalê temsîl bike. Lazim e dewleta Iraqê jî li gor destûra xwe vê mafê rewşa civaka Êzidî nas û qebûl bike. Meclîsa Gel a Şengalê bi qasî ku yekîtiya hemû pêkhatayên Şengalê temsîl dike, ewqas jî nirxên gelên Iraqê diparêze û temsîl dike. Li ser vê esasê Rêveberiya Xwecihî ya Şengalê, ji bo Iraqa demokratîk, federal û yekbûyî zemîna herî xurt e

Çend Rêgezên Giştî yên Hevpaymana Civakî

Meclîsa Gel a Şengalê, fikrê Netewa Demokratîk ji xwe re esas digire, çand û jiyana komînal weke pîvanê esasî ya hebûna civakî dibîne û xwe bi rîya komînan ava dike û rêvedibe

Çavkaniya hêz û rewabûna Meclîsa Gel a Şengalê beşdariya wekhev û azad a hemû gel û komên baweriyê ye

Meclîsa Gel a Şengalê li ser esasê demokrasiya xwecihî, xwe parçeyek ji ax û îdarêya Iraqê dibîne

Meclîsa Gel a Şengalê hebûna jinê weke hebûna civakî dibîne, di civaka demokratîk

de pêşengtiya jinê esas digire, fikrê hevjiyana azad pêş dixê. Di hemû qadan de pergala hevserokatîyê weke pîvanekê bingehîn esas digire

Meclîsa Gel a Şengalê parastina cewherî ji bo hemû gel, çand, ol û bawerîyan weke mafê rewa û xwezayî dibîne û di hemû qadan de xebatên parastina cewherî pêşdixê

Meclîsa Gel a Şengalê her cûre asîmîlasyon, qirkirina çandî, dagirkerî û talanê weke sûcên mirovahiyê dibîne. Li hemberî van êrişan berxwedana çandî û civakî weke mafê rewa digire dest

Dosya

Meclîsa Gel a Şengalê divê li ser esasê yas-'' ayên Iraqê were qebûl kirin. Weke rêveberiya cewherî ya Şengalê, wê ji parastinê heya aboriyê îradeya rêvebirina Şengalê temsîl bike. Lazim e dewleta Iraqê jî li gor destûra xwe vê mafê rewa ya civaka Êzîdî nas û qebûl bike

Pergala Civakî û Rêxistinî

Di Hevpeymana Civakî de Meclîsa Gel a Şengalê, weke pergala jiyana civakî û siyasî ya hemû gelan û komên bawerîyan tê tarîfkirin ku ev pergala bi komîn, meclîs, akademî, kooperatîf û sazîyên demokratîk pêşdikeve û civaka demokratîk ava dîke. Di Hevpeymana Civakî de erk û berpirsyariyên hemû sazî, komîte û lijneyan jî ji nû ve tên tarîfkirin. Meclîsa Gel a Şengalê ku wê xwe bispêre sîstema komînan, di heman demê de wê xwe bi rêyasazî, komîte û lijneyan di hemû qadên jiyana de bi gewde bike

Perspektîfa Têkilî û Tifaqan

Di dawîya Hevpeymana Civakî de perspektîfek ji bo xebatên têkilî û tifaqan a Meclîsa Gel a Şengalê jî hatiye destnîşankirin

**Meclîsa Gel a Şengalê wekhevî
û azadiya hemû gel, çand, bîr û
baweriyên ji xwe re esas digire,
pergala xwe bi hemû pêkhatayên
Şengalê re ava dike, diparêze û
rêvedibe**

Li gor vê

Meclîsa Gel a Şengalê li ser navê gelê Şengalê bi dewleta Iraqê, hêzên herêmî, saziyên navnetewî û bi gelan re têkilî û tifaqan pêşdixe

Têkiliyên di navbera Meclîsa Gel a Şengalê û dewleta Iraqê de li ser esasê hiqûq, edalet û demokrasîyê û di çarçoveya entegrasyona demokratîk de tê pêşxistin. Meclîsa Gel a Şengalê li ser navê civaka demokratîk bi dewleta Iraqê re têkilî pêşdixe, hebûna civaka Êzidî û gelên Şengalê li gel mafên wan ên bingehîn (xwerêvebirin û xweparastin) di çarçoveya Destûra Bingehîn a Iraqê de mîsoger dike

Meclîsa Gel a Şengalê her wiha bi dewletên herêmî û dewletên navnetewî re jî* li ser esasê naskirina jenosîda Êzidiyan û vegerandina mafên wan ên bingehîn, têkiliyan pêş dixe

**Meclîsa Gel a Şengalê di serî de gel, ol û baweriyên
li herêmê bi hemû gelên cîhanê re têkiliyên esasî û
stratejîk pêşdixe, avakirina civaka demokratîk a Şengalê
weke parçeyek ji têkoşîna demokrasî û azadiyê ya gelên
cîhanê dinirxîne, hêz dide têkoşîna demokrasîyê û ji
tevgerên azadî û demokrasîyê jî hêz digire**

Li her derê komîn, di hemû qadan de komîn Ji belgeyên 6.Kongreya MXDŞ'ê

Di 6.Kongreya Meclîsa Xweserîya Demokratîk a Şengalê de ku bi dirûşmeya 'Yekîtî, Azadî û Çareserî' hate lidarxistin, ji bo guherîna û nûkirina pergala civakî û rêxistinî jî nîqaşên bingehîn hatin meşandin. Rêveberiya Xweserîya Demokratîk a Şengalê ku bi vê kongreyê re wê xebatên xwe bi navê Meclîsa Gel a Şengalê bimeşîne, wê pergala xwe bi temamî bispêre avakirina komînên gund û taxan

Bi kongrê re wê li hemû tax û gundên Şengalê pêngaveke berfireh a avakirina komînan were destpêkirin da ku îradeya civaka Êzîdî û gelên Şengalê rasterast û xurtir derkeve holê. Ji bo vê, di kongrê de Rêzîknameya Komînan ku ji aliyê komîteya amadekar ve hatibû amadekirin hate xwendin. Di nîqaşan de hate diyarkirin ku di avakirina civaka demokratîk de, di pêşxistina rêveberiya cewherî û parastina cewherî de şaneya herî

esasî komîn e. Di serî de li kolan, gund û bajaran wê di qadên weke perwerde, ziman, çand, dîrok û ji bo hemû faalîyetên civakî, komîn werin ava kirin

Civakek an jî komek bê komîn, nikare bi awayek azad û demokratîk bijî û xwe rêvebibe. Ji ber vê rastiye komîn; şaneya kok û bingeha civakbûyîne ye. Komîn, tarzê hebûna civakê ye; civak li ser vê bi gewde dib

Komîn; cîhê pêşxistina wekhevîya jin û zîlam e, cîhê ava kirina hevjiyana azad e Civaka demokratîk-komînal çiqas were birêxistin kirin, wê hebûna civakî û hebûna mirovahiyê ewqas hebe. Hişmendiya

Çend xalên esasî ku di Rêzîknameya Komînan de hatine destnîşankirin bi vî rengî ne

netewa demokratîk xwe dispêre komînan. Neteweya demokratîk di asteke jor de wekî "komîna komînan" tê pênasekirin û xwe naspêre dewletê

Komîn, ne pergala partiyeke* siyasî ye ku hinek kes tevî bibin, hinek kes tevî nebin. Hemû nasnameyên cûda, bawerî, mezheb û komên civakî komîna demokratîk îfade dikin

Hemû beşên civakê, weke kedkar, gundî, karker, dikandar (esnaf), alimên olî, hunermend, xwendekar, mamoste, ciwan û jin dikarin di komînan de cih bigirin

Ne dewlet, ne malbat, ne jî eşîr nikarin ji pewîstiyên civakê re bibin bersiv û pirsgirêkên civakê çareser bikin. Her wiha nikarin yekîtiyê û parastina civakê jî pêk bînin. Ji her demê û ji her tiştê zêdetir pêwîstiya civakê pê heye ku li her derê komînên xwe ava û yekîtiya xwe pêşbixe

Şêwazê herî berfireh ê civaka demokratîk wê bi komînan were jiyîn. Çiqas şax û qadên civakî hebin, wê di tevahiya wan de komîn çêbin. Di serî de li kolan, gund û bajaran wê di qadên weke perwerde, ziman, çand, dîrok û ji bo hemû faalîyetên civakî, komîn werin ava kirin

Kongreya MXDŞ'ê ya 6. kongreya guhertin û veguhertinê bû

Beşa Hevpeyvînê ya bi Hevserokê Meclisa Gel a Şengalê Azad Hisên re

Di 28'ê Adar ê de, civaka Êzîdî û gelê Şengalê ji bo pêşxistina civaka demokratîk û xwe gihandina mafên xwe rêvebirin û xweparastinê gaveke din a girîng avêtin. 6.Kongreya Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê (MXDŞ) bi dirûşmeya 'Yekîtî, Azadî û Çareserî' hate lidarxistin. Di kongreyê de derbarê avakirina komînan, tifaq û yekîtiya Êzîdiyan û entegrasyona demokratîk a bi dewleta Iraqê re gelek biryarên girîng hatin girtin. Di kongrê de her wiha navê MXDŞ'ê weke Meclîsa Gel a Şengalê hate guhertin û rêveberiya wê ya nû hilbijartin. Weke Kovara Dijle me jî bi hevserokên Meclîsa Gel a Şengalê Azad Hisên û Xoxê Dexîl re derbarê encamên kongrê û hedefên dema pêş, hevpeyvîneke taybet kir

Em di destpêkê de di kesayeta EŞ.Dijwar de Şehîdên Rêveberiya Xweser û hemû şehîdên azadiyê bi rêzdarî bi birtînin û bejna xwe li ber wan ditewînin. Piştî fer-

mana 2014'an ku ji aliyê DAIŞ'ê ve li ser Êzîdiyan pêkhat, armanc û hedef ew bû ku koka Êzîdiyan biqelînin û ji hemû aliyên ve ji dîrokê tine bikin. Armanc ev bû, lê negihîştin armanca xwe. Piştî wê bi 5 mehan, di 14.01.2014'an de Meclîsa Avaker ava bû, di wê demê de hewce bû ku Meclîsek wisa were avakirin, bi hemû sazî û dezgehên xwe ve çî siyasî, civakî, çandî, leşkerî be, karibû xwe ji rewşek zor û zehmetî de derîne. Civaka ne tenê Êzîdî civakên din ên ku li Şengalê jiyên dikin jî bi heman êrîşan re rû bi rû man. Wek mînak mirov bêje, ji tinebûnekê rihek hat afirandin. Ev Meclîs xwe wisa berdewamkir û gihîşt roja me. Heta îroj me gelek bedelên giran dan, hemû şehîdên di bin banê vê sîwanê de ango di bin banê paradîgmaya netewa demokratîk de, gelek bedelên giran bûn. Bêgûman di hemû xebatan de jî zehmetî hebûn, piştî jenosîdê jî bi gelek şeran re rû bi rû hatin, hem jî aliyê dewleta tirk ve hem jî ji ali-



yê hin xêrnexwazên derdor ve. Disa dixwestin li cihê ku mane berdewam bikin, dibê Êzîdî tune bibin, wê darê hişk bikin, bişewitînin, ev xwestekên wan pêk nehatin ev jî bi saya şehîdan, ked û xebata hevalan pêk hat.

Yanî demek wisa bû pêwîst bû pêwîstiyên vî gelî hemû bihatana pêşwazîkirin. Di warê xizmetguzariyê de jî av, kerebe, rê, şaredarî, ev hemû bihatana avakirin û çêkirin. Di vî warî de şaredarî heta astekê karê xwe da meşandin, di heman demê de Asayîşa Êzîdxan jî bê rawest bê navber karê xwe kir û dike, dîsa xebatên YBŞ, YJŞ jî wisa berdewam in, bi taybet vana erkên xwe yê serke pêkanîne, yanî mirov dikare bêje Meclîsa Gel hatiye avakirin heta niha qonax bi qonax bi gelek serkeftinan gihîştîye vê astê. Civakê ev Meclîs jî xwe re weke hêvî dît, ji aliyê eskerî û ewlehî ve, pêwîst nedît ku kesekî ji Dihok û Hewlêrê an jî ji Necef û Kerbelayê were parastina wê bike. Ji ber ku şahîdî

ku şahîdî ji vê yeke re kir, yê ku li vir bûn piştî xwe danê û xwedî lê derneketin. Ji bo wê jî hewce dît ku zarokên vê civakê parastina vê civakê bikin. Mînak gelek caran tê gotin an jî em dibêjin ger ev Meclîs neba wê xelk venegeriya şengalê piştî ewqas felaketan, her çiqas hemû venegeriyabin jî dîsa pêşî li belavbûnê hatiye girtin. Meclîsa Gel a Şengalê di hemû waran de bar avêt ser milê xwe, ji bo berjewendîya vê civakê tevgeriya û wê wisa jî berdewam bike. Di serê her kesî de tabloyek ku rûyê zarokên vê civakê ya bi girî hebû, lê Meclîsa Xweser pêşî li vê girt

**Ji ber ku şahîdî ji vê yeke .
re kir, yê ku li vir bûn
piştî xwe danê û xwedî
lê derneketin. Ji bo wê jî
hewce dît ku zarokên vê
civakê parastina vê civakê
bikin**



Ji vê yeke re kir, yên ku li vir bûn pişta xwe danê û xwedî lê derneketin. Ji bo wê jî hewce dît ku zarokên vê civakê parastina vê civakê bikin. Mînak gelek caran tê gotin an jî em dibêjin ger ev Meclîs neba wê xelk venegeriya Şengalê piştî ewqas felaketan, her çiqas hemû venegeriyabin jî dîsa pêşî li belavbûnê hatiye girtin. Meclîsa Gel a Şengalê di hemû waran de bar avêt ser milê xwe, ji bo berjewendîya vê civakê tevgeriya û wê wisa jî berdewam bike. Di serê her kesî de tabloyek ku rûyê zarokên vê civakê ya bi girî hebû, lê Meclîsa Xweser pêşî li vê girt.

Miletekî ku bindestî, koletî qebûl bike ji xwe derdekî wî ye ku li azadiyê bigere nîne, miletekî ku hewldanên wî ji bo azadiyê hebe dikare azad bibe, em jî ew millet in ku li azadiyê digerin, hewldanên me wê li pêşîya vî gelî çirayek deyne û rêya wê geş bike

Guhertin û veguhertin

Ji 2014' an heta niha gelek guhertin û veguhertin li Şengalê çêbûn. Lê yek ji bingehên sereke di kongreya me ya 6'emîn de avakirina yekîtîyê bû, ku demê pêş emê zêdetir giranî bidin vê xebatê. Gotinek me ya Êzîdîyan heye di warê olî û felsefî de, dibêjin " Her dem bi demê re her dem bi xwedê re ", di vir de behsa kiras guhertin û xwe nûkirinê dike, di vê çarçoveyê de hewce tê dîtin ku em vî kirasî deynin û kiraseke nû li xwe bikin. Bi vî awayî derbasî merheleyek nû bibin. Ya din jî em wek Şengalî dema behsa azadiyê dikin, ger ku em li azadiyê digerin dixwazin bibin civakek azad, divê her tiştê me bi azadiyê re bibe yek, sedema tekoşîna em didin meşandin

ev e. Miletê ku bindestî, koletî qebûl bike ji xwe derdekî wî ye ku li azadiyê bigere nîne, miletekî ku hewldanên wî ji bo azadiyê hebe dikare azad bibe, em jî ew millet in ku li azadiyê digerin, hewldanên me wê li pêşiya vî gelî çirayek deyne û rêya wê geş bike. Divê êdî em bi hewldanên xwe karibin pêşî li fermanan bigrin û dîroka fermanan bikin dîroka serkeftin û azadiyê, jîyan bê azadî nameşe, ne di warê xwe birêvebirinê de ne di dîplomasiyê de di hemû warê jîyanê de ji bo jîyanek rast pêwistî bi azadiyê heye.

Em bala xwe bidinê niha dinya alem hemû pêwîstiya xwe bi yekîtiyê dibînin û ber bi yekîtiyê ve dibezin, nexwe xelasiya mezin di vir de ye, em jî weke gelê Êzîdî di nav xwe de ne yek in û yê herî zêde êşa vê dikşîne jî em in, çima em nebin yek? Yanî çî sedemek ku em nebin yek nîne, ger hebe jî divê em karibin bi sedemên hîn maqultir vê derbas bikin û bibin hêz, li derveyî vê divê hilbijêrek me yê cuda nebe.

Ger em behsa Peymana Sykes-Picot bikin, em niha di nav Şerê

Li şûna ku yek ji Musilê bê û civaka min bi rêve bibe, yên vê civakê jî ku karin vî karî bikin hene, bila yên vê civakê bin, ew şagirtên xwe perwerde bike, madem tu li gor zagonên xwe hemû pêkhatayên ku li Iraqê jîyan dikin nas dikî ez jî yek ji pêkhatayên Iraq ê me ti çima min nasnakî û mafê min qebûl nakî

Cîhanê yê Sêyemîn de ne û Rôjhilata Navîn ber bi dîzaynek nû ve diçe. Em jî wek civakek vê herêmê ger em negihîjîn maf û azadiya xwe emê karibin di nav van şeran de merheleyeke xurt derbas bikin? Ne xêr, ev ne gengaz e! Em bi gelê xwe hene, bi gelê xwe em bi hêz in, ger em karibin yekîtiyê û berxwedana xwe bikin yek emê karibin di asta dîplomasî de jî danûstendinan bi Iraqê re bikin ku ev pirsgirêkên di navbeyna me de ji holê rabin.

Çima Iraq me qebûl nake

Em tekoşîna vê yekê jî didin ku çima em hemwelatîyên Iraqê ne, lê Iraq me qebûl nake, em dizxwazin pêk ve xizmetê ji gelê xwe re bikin lê Iraq me qebûl nake, ev hemû bi



serên xwe pirs in. Rast e, di demek ku dewleta tirk zêde zext li ser Iraqê dikir ku di heman demê de jî bi êrîşên giran bi ser Şengalê ve hatin, heta roja îro jî hinek şêwazên wan êrîşan hîn jî berdewam in. Di vir de Iraqê demekê Rêveberiya Xweser dikir hincet digot: " Rêveberiya Xweser nikare xweseriyek xwe di Şengalê de hebe ji ber ku ne li gor destûra Iraqê ye." Em jî dibêjin baş e, ti behsa îdara herêmî dikî li gor nîzamdaxî an jî li gor destûra Iraqê, emê bibin îdareyek herêmî, emê bibin Meclisek gel, ku ji xwe em Meclisek gel in û bi gel re kar dikin. Û gel jî em in ji xwe, em ji dereke dûr nehatine vê derê, me nexwestiye ku li ser Iraqê hinek tiştan ferz bikin, mînak em dibêjin madem şaredariyek te di nav gund an bajarekî de heye û avê dide gel emê jî avê bidinê, ger ya te bi 5 hezarî dide emê bi 3 hezarî bidin gelê xwe. Ger şaredariya te nekaribe kehrebê çêbike emê çêbikin, yanî kurt û Kurmancî em dixwazin hevpar kar bikin. Li şûna ku

yek ji Musilê bê û civaka min bi rêve bibe, yên vê civakê jî ku karin vî karî bikin hene, bila yên vê civakê bin, ew şagirtên xwe perwerde bike, madem tu li gor zagonên xwe hemû pêkhateyên ku li Iraqê jiyan dikin nas dikî ez jî yek ji pêkhateyên Iraqê me ti çima min nasnakî û mafê min qebûl nakî


Em jî dixwazin bi zimanê xwe bixwînin, tiştêkî ku ne li gor zagonên Iraqê bin me ji Iraqê nexwestiye, em cardin dibêjin, em li ser maseyekê rûnên û diyalogekê bikin, lihevkirinek çêkin, ji bo berjewendiya Iraqê em bişêwirin. Em vê yekê jî bibîr bixin, ma ne dema DAIŞ ket Şengalê dest avêt jin, zarok û keçên

Tiştên ku em ji Iraqê dixwazin hêzên me yên parastina hundirîn hebin, bila ti hêz ji Iraqê neyên û me neparêzin. Ev civak baweriya xwe bi hêza xwe tîne, tiştê ku ti bikî vê hêzê di çarçoveya zagonên xwe de yasayî bike, bila li cihê xwe parastina civaka xwe bikin

Êzîdiyan, ma ne ew hêzên wan yên eskerî li vê derê bûn? Piştî xwe dan Şengalê, dijmin bêyî ku rastî astengiyekê bê milên xwe hejandin hatin li ser me bahozek rakirin. Wan vî barî ranekir lê çibû? YBŞ ê xwe ji xweliya fermanê avakir, rabû berxwedan kir, yê ku dîsa li ser axa Şengalê ala Iraqê rakiriye YBŞ bû, em bûn. Îro jî em dubare dibêjin, em hemwelatîyê Iraqê ne, hin biryarên ku li ser Êzîdiya werin ferzkirin, mînak dema tifaqiya 9 ê Cotmehê li ser Şengalê, hemû gelê Şengalê li ser linga bûn sedema xwe çî bû? Yek ji sedemên xwe ew bû ku biryar li ser Şengalê tê girtin lê biryar ne biryara gelê Şengalê ye. Mafekî min heye, gelo ez îro li vê derê rûniştî me û ez rabim mala yekî din bidim firotin. Ger ez rabim bazarê li ser mala wî bikim ku ji bo berjewendiyê wî be madem divê ew kes jî di wê biryarê de amade be, lê biryar li ser Şengalê dihatin girtin lê bê agahiya Şengalê dihatin girtin. Dîsa jî em dibêjin em ji bo lihevhatinek li gor zagonê te be jî, bi rêbazek maqûl ji danûstandinan re amade ne. Em naxwazin ev gelê ku hemwelatîyê te ne carek din bi jenosîdan re rû bi rû bimîne, çareseriyek jê re divê. Tiştên ku em ji Iraqê dixwazin hêzên me yên parastina hundirîn hebin, bila ti hêz ji Iraqê neyên û me neparêzin. Ev civak baweriya xwe bi hêza xwe tîne, tiştî ku ti bikî vê hêzê di çarçoveya zagonên xwe de yasayî bike, bila li cihê xwe parastina civaka xwe bikin. Em nabêjin bila dibistanên Erebî nebin li vê derê, lê bila di wan dibistanan de mafekî min jî hebe, ku zarokên me bizimanê xwe perwerde bibin, di navbera me de heta niha jî ev nakokî berdewam in.

Ji hemû aliyan ve mirov dikare bi mînakên berfireh jî ispat bike ku civaka Êzîdî di dîrokê de civaka herî kevn e ku bi komînî jîyan kiriye

Lê ez wisa bawer dikim, li gor vê kongreya ku hatiye çêkirin, li gor bernameya li pêşiya me emê dîsa amade bin û deriyên me vekirî ne, kê destê dostaniyê dirêjî me bike emê li hewa nehêlin, her kê ji bo berjewendiyê vê civakê nêz bibe emê li kêleka wan cîh bigrin. Mînaka ku Rêber Abdullah Ocalan dibêje: 'Hemû hêza dinyayê bibe yek û bi ser me de were emê serî daneynin û hemû hêza dinyayê bibe ya me jî emê êrîştî kesî nekin.' Em jî ji xwe re vê esas digrin. Şengalê rojekê êrîştî ser kesî nekiriye, kesî nedîtiye ku Êzîdiyan talana kesî kirine. Lê em bi hêvî ne ku Iraq di bin bandora hêzên derve de nemîne, karibe pirsgerêkên heyî bi awayek yasayî çareser bike. Weke tê zanîn gelek hesp di axa Iraqê de dibez-





in, her kes jî bi şûr û mertal e lê em vê yekê jî naxwazin em dibêjin jiyaneke bi rûmet, bi çand, ol, bawerîya xwe jiyankirin, bi hev re di nav aramiyê de heja ye ji bo me.

Yekîtiya Êzîdiyan

Di pêvajoya entegrasyonê de mirov bêje hemleyek wisa hat destpêkirin ku hemû Êzîdiyên di Şengalê de ji hev cuda disekin. Hêzên ku Êzîdî ne lê fikrên wan ji hev cûda ne qet nebe di hin mijaran de bibin yek, xebatek wisa hat destpêkirin. Di vir de guhdarkirinek jî hebû, mirov dikare wisa bêjê kêmkirî hebûn ku ji vê pêvajoyê ne amade bûn. Bi xwe jî anîn ziman ku divê di mijarên ewlekariyê de yekîtiyek me hebe, tiştê diyar dibe ji bo entegrasyona bi Iraqê re hemû jî amade ne lê esasî diyalog li ser YBŞ'ê tê meşandin. Ji ber ku beriya hemûyan YBŞ hebû li vir, yê ku dest avêt parastina Çiyayê Şengalê YBŞ bû. Careke din dîsa banga me ev e, ji bo ku em biserkevin divê em yek bin.

Komîn û Meclisên gundan

Dema Meclîs hatin avakirin, wê demê hewce bû ku Meclîs bîn avakirin, rewşa ku em tê de bûn rewşa fermanê bû. Rast e ev civak ji jiyana komînê ne xerîb e, ji bere ve bi komînê jiyana kiriye lê ne bi rêxistinê bûye, mirov wisa bi nav bike. Ji hemû aliyan ve mirov dikare bi mînakên berfireh jî îspat bike ku civaka Êzîdî di dîrokê de civaka herî kevn e ku bi komînê jiyana kiriye. Me jî di zarokatiya xwe de ev ji nêz de didît ku gund an cînar çawa bi hev re dibûn alîkar an jî hevdû xwedî û temam dikirin. Jiyana di hemû karan de hevpar bû, ez ezî nebû em hebû. Yanî bi kurtasî dixwazim bêjim ku em car din vê bi şêwayek rêxistinî û bi zanebûn zîndî bikin, jiyaneke li derdora komînê biherikînin. Yanî ferqa di navbera komîn û Meclîsê de komîn hîn jêrdekirî e û hîn zêdetir jiyana civakê ye, ev hîn zêdetir wê bihêle ku civak ji hevdû berpirsiyar bin û haydar bin.

Heta bi temamî pergala komînan were runiştin bêguman wê zehmetiyên xwe hebin lê dema ku bi rêk û pêk be, di xe-

batên wê de an jî bi pêşxistina afrîneriyê de wê barê me sivik bike, hîna xebatek ku nû emê giraniyê bidinê, ya herî girîng divê civak bixwe vê xebatê aydê xwe bibîne û xwedî lê derkeve. Wisa bi demê re bi dewlemendiya xwe şênber bibe û bibe şêwayek jiyanê. Ked dixwaze, jixwe bi hezkirin û ked dayînê dikare bibe berhem û malê civakê, em di wê baweriyê de ne pirs-girêkên me yên ku li Şengalê hene wê bi rêka komînan dakeve asta herî jêr.

Ji bo Kongreya Êzîdiyan

Piştî 2015'an gelek caran salane Civîna Kordînasyona Civaka Êzîdî dihat lidarxistin, heta demekê wisa bû, lê ji bo ku kongreyek Êzîdiya ya giştî were lidarxistin em wek Meclisa Gel a Şengalê, bi hemû hêza xwe emê ji bo vê amade bin ku karibin yekîtiyek Êzîdiyan bi kongreyek wisa li dar bixin, me beriya niha jî anî ziman ku bi hin beşan re em hatin gel hev û niqaş pêşketin.

Pergala Hevserokatî

Pergala hevserokatiyê bingeha xwe ji pergala netewa demokratîk digire, ger em di rastiya Şengalê de bigrin dest, beriya em bi vê pergalê bikevin rê nîzama saziyan tenê serokati bû, ger cîgirê serok jî heba ew jî piranî mêr bû, di hemû saziyên civakî de jî wisa bû. Ferqa di navbera hevserokatî û serokatî de hevdû temamkirin e, ya din jî naskirina îradeya jinê ye, redkirina birêvebirin û koletiya jinê ye. Ya rastî, di bingeha civaka Êzîdî de naskirina jinê heye lê piştî ra ew jî ji civakên derdor bandor bûye, guheriyê. Lê piştî fermanê bi avakirina pergala hevserokatiyê gelek tişt hatin

guhertin li ser esasê ku dibê wekhevîyek di mafên jiyanî de hebe bi taybet di warê rêvebirina civakê de. Cewherê hevserokatiyê ev e, lê pergala serokatiyê bingeha xwe ji desthilatdariyê tê, ne pergalek demokratîk e, civakbûnê nahewîne.

Herî dawî jî em ji xebatên we re serkeftinê diwxazin û pîroz dibînin, kedek hêja ye. Bangawaziya me ji bo hemû xwendevanên Kovara Dicle heye ku, karibin bi her kesî bidin naskirin û xwendin. Ya din jî carek din banga me ji bo civaka me ew e û em her dibêjin tifaq û yekîtiya xwe xurt bikin, dem dema yekîtiyê ye, yekîti deriyê me yê xelasî û azadiyê ye, kî bi kîjan partiyê re dibe bila bibe ya girîng ji bo me yekîtiya Êzîdiya ye, parastina çand û ola vê civakê ye, divê hemû kes wisa nêz bibin.

Beşa Hevpeyvînê ya bi Hevseroka Meclîsa Gel ya Şengalê bi Xoxê Dexîl re;

Kar û xebatên heta niha hatine meşandin bi giştî mirov dikare bêje ji bo xizmeta civakê bûn, li kêleka kê m û kurtasiyên heyî jî kar û xebatên hatine meşandin heta astekê cihê xwe girtine. Li gor pêvajoyan an pêwîstiyên karên girîng jî hatine kirin. Ji bo xwe gihandina hemu beşên civakê; jin, ciwan, her wiha ji bo avakirina komînan kar û xebat hatine meşandin. Perwerdekirin, xwe rêxistinkirin, tevî zehmetî û astengiyan jî, li hember hem êrîşên derve hem jî yên hûndir ev hemû astek derxistine holê. Yanî heta cihekî karî pilan û êrîşên ku li hemberî civaka Êzîdî dihatin kirin heta cihekî vala derxe.

ferman ne tişteki ji rêzê 74 ye. Meclîsa Xweser di encama 74 ferman û bedelên giran de avabûye, ji ber vê jî ev şêweyê xwe bi xwe rêvebirinê garantiya hebûna Êzîdiya ye

Meclîsa Xweser heta niha kar û xebatên ku da meşandin, hewl daye ji bo civakek karibe xwe bike civak, ji ber ku civaka Êzîdî ji alî dijmin ve derba herî giran ya mirinê ku bi tinebûnê re rû bi rû mabû xwar. Di ser de, di nav xwe de jî parçeyî ye, yekîtiyekê ku karibe wê li hemberî hemû tofanan biparêze nebû, ji ber vê yekê jî, hewldanên Meclîsa Xweser ya sereke avakirina vê civakê bû, civakek çawa dikare xwe biparêze ku karibe çarenûsa xwe bi xwe diyarbike, vê yekê jî ji dost û dijminan re jî bide diyarkirin ku em bi vê rêbazê dikarin hebûna xwe biparêzin. Ji ber ku civaka Êzîdî di fermanek mezin re derbas bû, vê civakê di dîroka xwe de pala xwe dave kê rastî qetlîaman hatiye, ji ber vê jî baweriya wê ya ku hinek din ji derve werin ewlehiya wê bigrin nemaye.

74 ferman ne tişteki ji rêzê ye. Meclîsa Xweser di encama 74 ferman û bedelên giran de avabûye, ji ber vê jî ev

şêweyê xwe bi xwe rêvebirinê garantiya hebûna Êzîdiya ye. Bêguman Meclîsa gel jî, bi xwedî derketina civakê dikare hîn xûrtir û bi hêztir bibe. Çima heta niha dewleta Iraqê jenosîda ser Êzîdîyan qebûl nekiriye? Yek ji sedemên vê mirov dikare bêje ku Êzîdî hîna hemû venegeriyane ser axa xwe û bi yek dengê doza mafê xwe nekirine, ev jî êşek û zehmetiyek mezin e ji bo me, ji dijmin re dibe hincet ku karibe bêje civak ne bi we re ye. Wek tê zanîn hîna beşek civaka me di kampan de li derveyê Şengalê jîyan dike, di heman demê de di xeteriyekê de ye jî, lê rixmî hemû tiştan jî, hewldanên avakirin û yekgirtina vê civakê hebûn û wê hebin jî, heta digihîjin çareseriyêke yasayî û bingehîn.

Ji Bo Dema Pêş

Barê ku kongreya 6'emîn daye ser milê me, pilansazî û biryarên girîng in. Bêguman wek me beriya niha jî destnîşankir, wê xizmeta civakê be. Ji bo îradeya gelê Şengalê bê naskirin, metirsiyên li ser gelê me werin rakirin tiştê dikeve ser milê Meclîsê wê pê rabe. Mijarên esasî û girîng çî yekîtiya navxweyî dibe, çî bi hêzên eleqedar re rêkên dîplomasî, hûqûq û siyasî dibe, wê xebatên di vê derbarê de hîn zêdetir bînin xûrtkirin û hewldanên encam girtinê bînin dayin. Ya din jî avakirina komînan di heman demê de çanda komînan di jiyana civakê de dana rûniştandin, yek ji xalên girîng jî ev e ku divê civak bi afirandinên xwe karibe xwe têr bike û bi rêve bibe, jixwe di civaka me de ev bingeh heye lê bandora kapîtalîzmê her ku diçe civakê ji vê yekê dûr dixê

û mûhtacê xwe dike. Yek ji armancên komînan jî, afirandina keda azad e û ev li civaka me jî tê, ji ber ku di cewher de neheliyaye, kariye cewherê xwe jî heta astekê biparêze. Armanc ku karibe carek din xwe zindî bike, di vî warî de jî karibe şert û mercên aboriya xwe avabike û xwe bi xwe birêvebibe. Çawa bi Rêveberiya Xweser bû modelek, bi komînan jî dikare bibe modelek.

Ferqa Kongreya 6'emîn

Niha bi taybet yekîtiya Êzîdiya xistina rojevê û bernameya xwe, ku ji bo yekîtiya Êzîdiya kongrek bê lidarxistin, ev wek biryarên kongrê bûn, yanî li gel kê dibe, fikra xwe ya siyasî çî dibe bila bibe, lê dema mijar dibe man û neman li hember êrîşan bi tifaq û yek deng bin, bi vî awayî karibin îradeya Şengalê bidin qebûlkirin. Ya din jî, wek me da diyarkirin, li ser xebatên komîna û parastina cewherî hat rawestandî.

yên ku piştî fermanê herî zêde bi hêrsa tolhildanê tevgeriyan û xwestin bixwe tola xwe hilînin û ji bo vê şehîd jî dan jin in. Ev jî zanebûnek civakî, têkoşîn, şerkirin, hêza xwe naskirin û azadiyê di jinên Şengalê de da avakir

Ji bo nûnertiya jin a di kongrê de, Rêber Apo bixwe dibêje ya ku pêşengiyê ji civakê re bike jin e, şiyara me jî ev e, em dibêjin civakek bê rengê jinê bi taybet jina azad, nabe civakek xûrt û demokratîk. Yê ku herî zêde di fermanan de bedelên herî giran dane jin in, yê ku piştî fermanê herî zêde bi hêrsa tolhildanê tevgeriyan û xwestin bixwe tola xwe hilînin û ji bo vê şehîd jî dan jin in. Ev jî zanebûnek civakî, têkoşîn, şerkirin, hêza xwe na-



skirin û azadiyê di jinên Şengalê de da avakir. Rêber Apo got; jinê tahma azadiyê girtiyê êdî ne gengaz e ku dest ji têkoşîna azadiyê berdin. Ev ji bo jinên Şengalê jî derbasdar e û têkoşîna vê didin, ji bo ku em vê têkoşînê hîn bilindtir bikin wê kar û xebatên me ji bo ku xwe bigihînin hemû jinên Şengalê her weha jinên Êzîdî yên li dervey Şengalê jî wê berfirehtir bidomin.

avakirina komînan di heman demê de çanda komînan di jiyana civakê de dana rûniştandin, yek ji xalên girîng jî ev e ku divê civak bi afirandinên xwe karibe xwe têr bike û bi rêve bibe, jixwe di civaka me de ev bingeh heye

Pergala hevserokatîyê di civaka Êzîdî de, dîroka xwe zêde ne dirêj e, piştî fermana 2014'an ket jiyana gelê Şengalê. Vê jî rê li ber wê yekê vekir û da fêrkin ku jin û mêr dikarin di eynî astê de heman karî bikin. Jin dema pêşî lê were vekirin, di saziyên civakê yên herî bilind de pêşengî ji çareserkirina pirsgirêkên civakê re dike, di heman demê de parastina wê jî dike, vê yekê girêdana jinê ya bi civaka demokratîk, ehlaqî û polîtîk re jî da diyarkirin. Jin yek ji hîmên esasiyê civakê ye, ya herî zêde bi axa xwe, çanda, xwe, civaka xwe ve girêdayî

ye jin e. Nûnertiya azadî û mafên jinê jî nebe nabe ye. Pergala hevserokatîyê garantiya civaka demokratîk e. Bêgûman pergala hevserokatî gelek tişt di warê zîhniyeta zilam de, di mêzandina li jinê de gelek ferasetên çewt şikandiye. Ev ji bo jinên Êzîdî destkeftiyê mezîn e. Xwe rêvebirin, rêxistinkirin, pirsgirêkên xwe çareserkirin, di têkoşîna cînsî de xwe pêşxistin ev gelek girîng in. Ji bo jinên Şengalê uûhertinên nû ne. Niha erka ku dikeve ser milê jinê, di demê pêş de hîn zêdetir çalakkirina vê, berfirehkirina xweseriya xwe û baş rêxistinkirin e.

Bêgûman pergala hevserokatî gelek tişt di warê zîhniyeta zilam de, di mêzandina li jinê de gelek ferasetên çewt şikandiye. Ev ji bo jinên Êzîdî destkeftiyê mezîn e

Herî dawî em vê dibêjin, em Kongreya 6'emîn li gelê Şengalê pîroz dikin, kongreyek serkeftî bû, ji bo ku cihê xwe bigire divê em bi hemû hêza xwe xebatê bidin meşandin bê rawestan. Ji ber ku cîhan di nav kelekekê de ye, em jî weke gelê Êzîdî di vê cîhanê de di nav guhertin û veguhertinê de ne, ji bo vê jî tevger û xwîdan pêwîst e. Li ser ve esase em ji gelê xwe re serkeftinê dixwazin, bi rêka Kovara Dîcle silavên xwe rêdikin.



İbrahim Êzîdî

Pêşeroja Êzdiyan di Entegrasyona Demokratîk de

Pêvajoya entegrasyona demokratîk a ku îro li seranserî Kurdistan û Rojhilata Navîn wekî rojeveke sereke û çarenûsî tê nîqaşkirin, ne tenê guhertineke îdarî an jî sererastkirineke sînorî ye; ev pêvajo di eslê xwe de encama felsefeyêke kûr e ku dixwaze bingeha jiyana hevpar a gelan li ser hîmên azadî, wekhevî û rûmeta mirovahiyê ji nû ve ava bike. Dema em di derbasbûna salekê li ser 'Banga Aştî

hêviyê. Lê belê, her çiqas Tevgera Azadiyê û Rêber Apo bi peyamên xwe îradeyeke xurt a çareseriyê nîşan dabin jî, aliyê dewletê hîn jî di nav dudiliyêke stratejîk de ye. Divê êdî dewlet ji polîtîkayên rojane û taktîkên demkî derkeve û gavan di asta qanûnî û destûrî de biavêje, ji ber ku çareseriyê rastîn bi gotinên vala nabe; ew bi naskirina nasnameya demokratîk a gelê Kurd û bi misogerkirina azadiya fizîkî



û Civaka Demokratîk' de li qonaxa borî û destkeftiyên heyî dinihêrin, em dibînin ku tevî hemû astengî û polîtîkayên zextê, di nav salekê de gavên dîrokî hatine avêtin. Ev gavên ku bi kedeke bêhempa û bi pêşengiya ramanên Rêber Apo hatine hûnandin, ne tenê rê li ber şerên mezin girtine, lê di heman demê de ji bo gelê Kurd û hemû gelên herêmê bûne çirayêke

ya Rêber Apo pêkan e. Azadiya fizîkî ya Rêber Apo mifteya vekirina deriyên aştiyêke mayinde ye ku dikare hemû Rojhilata Navîn ji qeyranên kûr rizgar bike.

Dema em bala xwe didin ser Şengalê, em dibînin ku ev felsefeya demokratîk li wir gihiştîye lûtkeyêke pratîkî. Civaka Êzîdî ya ku piştî fermana 74'an a di sala 2014'an de bi



fermaneke tinekirinê re rû bi rû ma, hebûna xwe bi fikrên Rêber Apo parast û sîstema xwe ya xwebirêveberiyê ava kir. Şengal îro ne tenê herêmek e, lê qada pratîkbûna neteweya demokratîk e. Kongreya 6'emîn a Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê (MXDŞ) ku di 28'ê Adarê de hat lidarxistin, di vê xalê de werçerxaneke dîrokî ye. Di vê kongreyê de meclîsê xwe wekî «Meclîsa Gelê Şengalê» bi nav kir, ku ev yek nîşaneyê kûrbûna rêxistinî û civakî ye. Ev guhertina nav ne tenê guhertineke teknîkî ye; ev tê wateya ku meclîsê êdî hemû pêkhatyên Şengalê, ji Êzidî, Ereb û kêmeteweyên din, di bin sîwana xwe de kom dike û dibe vîna yekbûyî ya gelê herême. Di encamnameya kongreyê de bal hate kişandin ser girîngiya xwe-rêxistinkirina Êzidiyan û entegrasyona demokratîk a bi dewleta Iraqê re. Ev peyama nîşan dide ku Şengal naxwaze ji Iraqê qut bibe, lê dixwaze di nav Iraqê demokratîk de bibe xwedî statu û vîna xwe ya siyasî bide qebûlkin.

Tevî ku Şengal ji aliyê erdnîgarî ve dûrî Tirkiyeyê ye, gefên berdewam ên dewleta tirk ên li ser vê axê nîşan didin ku eniya dijî-demokratîk ji modela xwebirêveberiya Şengalê ditirse. Ew ditir-

sin ku modela Şengalê bibe mînak ji bo hemû Rojhilata Navîn. Şerê taybet ê ku li ser Şengalê tê meşandin, armanc dike ku vîna civaka Êzidî bişikîne û wan ji axa wan a pîroz dûr bixe. Lê belê, biryarên Kongreya 6'emîn nîşan dan ku gelê Şengalê di parastina xweseriya xwe de biryardar e. Di vê navberê de, rola hikûmeta navendî ya Iraqê jî mijareke sereke ye. 11 sal di ser fermanê re derbas bûn, lê hîn jî Iraq naxwaze Şengalê wekî parçeyê wekhev û xwedî maf bibîne. Civaka Êzidî û hêzên parastina Şengalê bi hezaran şehîd dan da ku axa Iraqê ji tarîtiya DAIŞ'ê biparêze, lê îro Bexda mafên wan ên herî bingeîn nas nake û bi peymanên mîna 9'ê Cotmehê hewl dide vîna gelê Şengalê bi serê wan ve bixîne. Helwesta Iraqê ya bêçareseriyê tenê xizmeta dijminên demokrasiyê dike. Pêwîst e hikûmeta Iraqê êdî Şengalê wekî «Meclîsa Gelê Şengalê» û îradeyê siyasî ya rewa qebûl bike. Entegrasyona demokratîk a ku di kongreyê de hat nîqaşkirin, çareseriya herî maqûl e: Şengaleke xweser di nav Iraqê demokratîk de. Ev model, yekparebûna Iraqê xurttir dike, ji ber ku civakeke ku mafên wê hatibin naskirin, dê zêdetir xwedî li welatê xwe derkeve.

Di encamnameya kongreyê de bal hate kişandin ser girîngiya xwe-rêxistinkirina Êzidiyan û entegrasyona demokratîk a bi dewleta Iraqê re. Ev peyama nîşan dide ku Şengal naxwaze ji Iraqê qut bibe, lê dixwaze di nav Iraqê demokratîk de bibe xwedî statu û vîna xwe ya siyasî bide qebûlkin



Parastina Şengalê ya ku ji aliyê zarokên vî gelî, YBŞ û YJŞê ve tê kirin, rûmeta vê civakê ye. Divê ev hêz di asta navneteweyî û di qanûnên Iraqê de bi awayekî fermî werin naskirin. Hêzên parastina Êzidiyan ne li derveyî qanûnê ne; ew bersiva herî meşrû ya li dijî qirkirinê ne. Kongreya 6'emîn a meclîsê ev rastî careke din bi dengê bilind anî ziman û destnîşan kir ku bêyî parastineke cewherî, entegrasyoneke rasteqîn ne pêkan e. Di bingeha hemû van geşedanên de, rola jinan xala herî sereke ye. Wekî ku Rêber Apo di peyamên xwe de her tim diyar dike, bêyî azadiya jinan, azadiya civakê xeyalek e. Li Şengalê, jinên Êzidî yên ku di fermanê de hatin firotin û rastî her cure tundiyê hatin, îro bûne pêşengên pergala nû. Meclîsa Jinên Êzidî û tevlibûna jinan a di nav Meclîsa Gel a Şengalê de, garantîya herî mezin a entegrasyona demokratîk e. Ger jin di nav sîstemê de bi vî û nasnameya xwe cih negirin, ew sîstem dê di demeke kurt de bibe dubareya zihniyeta mêrperest. Şoreşa jinê ya ku li Şengalê şîn bûye, îro mînakê herî zelal a rizgariya civakî ye.


Wekî encam, em dikarin bibêjin ku pêvajoya entegrasyona demokratîk ne tenê projeyeke li ser kaxezê, lê vejiñeke çandî, mirovî û civakî ye. Serkeftina vê pêvajoyê girêdayî berpirsariya hemû aliyan e. Dewleta tirk divê ji zihniyeta înkare rizgar bibe û azadiya Rêber Apo wekî miftiya aştiyê bibîne. Hikûmeta Iraqê divê dev ji polîtîkayên zextê berde û îradeya Meclîsa Gelê Şengalê nas bike. Şingal bi 6'emîn kongreya xwe nîşan da

Parastina Şengalê ya ku ji aliyê zarokên vî gelî, YBŞ û YJŞê ve tê kirin, rûmeta vê civakê ye. Divê ev hêz di asta navneteweyî û di qanûnên Iraqê de bi awayekî fermî werin naskirin



ku ew ne tenê ji bo xwe, lê ji bo hemû Iraqê û Rojhilata Navîn modeleke jiyane pêşkêş dike. Azadiya Rêber Apo, statuya Şengalê û pêşengiya jinan sê stûnên sereke ne ku dê pêşerojê ronahî ava bikin. Ev têkoşîn dê heta misogerkirina entegrasyoneke rastî û demokratîk, ku tê de her kes bi nasnameya xwe ya azad bijî, bi biryardarî li her qadê berdewam bike.

Pêşeroj ne ya zihniyetên tarî û înkare, lê ya gelên ku li dora fikrê azadiyê dibin yek e.



Ehmed Huseynî

Kobanê

çiya bangî deştê kir'

Kobanê bersiv da şengalê:

Li vir im

Li vir im

Li vir im

Navika azadiyê dibirim

Bi baskên xwînê

dê ber bi te ve bifirim...!

Kobanê

ka were!

serê xwe deyne

ser çoka min

ez ê

ji te re

strana derwêşê evdî

bibêjim

were

ez ê

xwîna dilê xwe

bi ser rihana navê te de

birêjim...!

Porê te yê reş û dirêj

Bi alî kîjan azadiyê ve!!?

dibeze

Destên xwe ji kuştina min

daweşîne

û careke din

ji min re, welatekî

di azadiya porê xwe de...

bibîne



Çiğdem dogu

Çima Niha dema jinê ye

Niha pêngava KJK'ê bi navê "Niha dema jinê ye" hate diyarkirin û me bi vî rengî starta wê da. Helbet jinan 8'ê Adara îsal berê di qadan de nîşan dan. Çi li Bakurê Kurdistanê û çi li Rojavayê Kurdistanê, di nav jinan de pir berê dest pê kir. Ev jî girîng e. Yanî dema jinan pir kêmbû. Niha her ku têkoşîna jinê pêş dikeve, di rastiye de jin demên xwe zêdetir dikin. Yanî ev pir bi wate ye û me jî wekî simbolîk got ji 2'yê Adarê heta 8'ê Adarê, bi hinceta destpêkirina pêngavê, em bi perwerde û çalakiyên mîna vê bi giraniyeke mezin bigirin dest û bi vî rengî dest bi pêngavê bikin. Helbet ev ne tenê ji bo pêvajoya 8'ê Adarê ye, dê bibe serdemek ku em mîna kampanyayek û pêngaveke salekê bigirin dest. Me wekî "Niha dema jinê ye" diyar kir. Helbet wateya vê jî heye. Çima "Niha dema jinê ye"?

Di rastiye de gava em li Kurdistanê, li her çar parçeyên Kurdistanê, li Rojhilata Navîn û bi giştî li cîhanê dinêrin, em dibînin ku çi qetlîamên mezin ên jinan pêk tên. Qetlîamên zarokan pêk tên. Di rastiye de qetlîama jiyane ye; yanî girêdayî vê em dibînin ku jiyana bi giştî tê qetilkirin. Em ji qetilkirina xwezayê bigirin heta felsefeya jiyane, yanî rastiya ku em jê re dibêjin jiyana mirovan û jiyana civakê, em dibînin ka çawa tê tune kirin. Nexwe, rakirina vê û serûbinkirina vê rastiye dê bi kê re bibe? Heger kirdeya vê jin be, yanî heger jin wekî kirdeya pirsgerêkan hatibe nîşandan, dê kirdeya çareseriyê jî jin be. Em vê yekê bi formulasyona "Jin, Jiyana, Azadî" jî îfade dikin. Ji ber vê yekê, em asteke nû lê zêde bikin, bînin asteke nû. Lewma me got ji bo çareseriyaya van hemû pirsgerêkan heger jin pêşeng

be, wê demê ev dem dema jinê ye. Yanî em hinekî din bala xwe bidin wir; erkên têkoşîna jinê çi ne, berpirsiyariyên wê çi ne? Mînak ji pirsgirêkeke ekolojîk bigirin heta pirsgirêkên zarokan, ji aboriyê bigirin heta pirsgirêkên tenduristiya, perwerdeyê, qetlîamên jinan, tundiya ku lê tê kirin, pirsgirêkên di nav malbatê de û hwd... Yanî mudaxalebûna jinê di her tiştî de, girtina berpirsiyariyê û têkoşîn, pêşxistina rêxistinîya xwe, nîşandana çalakî û helwesta xwe... Di van hemûyan de em dibêjin "Niha dema jinê ye" Heger perwerde be niha dema jinê ye, heger pirsgirêka ekolojîk be niha dema jinê ye, heger pirsgirêka zarokan hebe niha dema jinê ye. Niha dema xwedîderketina li berpirsiyariyên me ye. Yanî di gelek aliyan de di rastiya de wekî vexwendina hemû jinan û di serî de jinên Kurd ber bi berpirsiyariyê ve ye. Banga rêxistinbûn û çalakiyê ye. Wateyeke wiha hildigire. Lewma me dît ku diyarkirina dirûşmê bi vî rengî girîng e.

Heger em li ser jinên Kurd binirxînin, mînak jinên Kurd bûne çar parçe. Ji bo misogerkirina yekîtiya neteweyî ya jinan, niha dema pêşengî ya jinan e. Li her çar parçeyên Kurdis-

Em vê yekê bi formulasyona "Jin, Jijan, Azadî" jî îfade dikin. Ji ber vê yekê, em asteke nû lê zêde bikin, bînin asteke nû. Lewma me got ji bo çareserîya van hemû pirsgirêkan heger jin pêşeng be, wê demê ev dem dema jinê ye

tanê jin pirsgirêka tundiya dijîn, ji pirsgirêkên pergale bigirin heta pirsgirêkên ku kapîtalîzmê anîne... Mînak li dijî van pirsgirêkan "Niha dema jinê ye", yanî em li dijî vê têkoşînê bikin. Bi taybetî bi belgeyên Epstein re li seranserê cîhanê rewşên hovîtiyê derketin holê. Li seranserê cîhanê mînak hemû jin; heger em niha têkoşîn nekin wê demê em ê kengî bikin? Heger niha ne dema jinê be, dê kengî bibe dema jinê? Ev ji bo me tiştên pir girîng in.

Yek jî, ez dixwazim vê bi awayeke felsefî diyar bikim; dem di heman demê de rastiyeke afirîner e. Dem ava dike, dem heyî dike, di rastiya de rastiyeke ku



hebûnê misoger dike ye. Ji ber vê yekê em bi taybetî dibêjin rastiya “kujerê kastîk” Rastiya kujerê kastîk kengî civaka dayîksalarî parçe kir, kir du parçe, ji wir nakokiya jin û mêr derket holê... Yanî bi deh hezaran sal in mîna ku jin tunebûna vê dijî. Yanî ji aliyê vînê ve, fîzîkî ve, wekî tundiyê, di rastiye de her tim tunebûna vê û bêdemiya vê jiyay kir.

Bi temamî yanî wateyeke wê ya îdeolojîk, felsefî û stratejîk jî heye. Bi hezaran sal, bi deh hezaran sal jin nikarîbûn dema xwe bijîn, nikarîbûn

mînak têkoşîna partîbûna jinê, têkoşîna azadiya jinê, pergalbûna konfederal a jinê... Ev hemû di rastiye de têkoşîna jinê ya ji bo afirandina dema xwe bû. Em bi xwedîderketina li vê mîrasê îro ve dirûşmê bikar tînin. Nexwe em nikarin bibêjin “Îsal dest pê kir”, ev ne rast e. Lê em dixwazin bala xwe bidin ser vê. Yanî em dixwazin vê mîrasa têkoşînê ya ku heta îro hatiye meşandin, zêdetir ber bi têkoşîna hebûnê û têkoşîna afirandina dema xwe ve bikişînin. Esasê dirûşma me hinekî dispêre vir. Mezinkirina wê mîrasê, hinekî din bi baldarî pêşx-



istina wê û pêkhatina hamleyeke nû ya polîtîkbûnê... Yanî mirov dikare bi vî rengî jî îfade bike.

Rêber Apocarekê tespîteke wiha kiribû; ez dixwazim vê jî diyar bikim. Ji ber ku wateyeke vê pêngavê ya wiha jî heye: “Ji îdeolojîkbûna jinê yanî îdeo-

hebûna xwe wekî vîn bijîn. Her tim di bin zexta serdestiya mêr de, îdeolojiya wî, artêşbûna wî, siyaseta wî û rastiya wî ya ku jiyane bi giştî dorpêç kiriye... Em ji vê re dibêjin “kujerê kastîk”. Bi rastiyeke wiha, jinê hebûna xwe bi vî rengî jiyay kir; yanî ev di rastiye de ne hebûn bû, ne dema wê bû, ne jî hebûna wê bû.

Helbet em nikarin bibêjin “Têkoşîna hebûnê ya vê niha derket holê”. Bê guman têkoşînên femînîst, têkoşînên cihêreng ên jinan... Mîrasa têkoşîna jinê ya 52 salan a ku bi PKKê re derket holê, mîrasa 30 salan a artêşbûna jinê,

lojiya azadiya jinê ber bi polîtîkbûna azadiya jinê ve”. Ji ber vê yekê, em dixwazin bi vê pêngava xwe re, wekî pêngava azadiya jinê, gaveke nû bavêjin û têkoşîna xwe bi awayekî xurtir ber bi qonaxeke nû ve bibin. Yanî ji bo pêngavê ez dikarim bi giştî van tiştan bibêjim.

Di warê demê de jî demek girîng e. Ji ber ku hema bêje her bernameya ku em pê dest pê dikin, bi nûçeya şerekî nû dest pê dike; nûçeyên şer ên li qadeke nû, di navbera du dewletan an jî gelan de... Em her tim bi nûqaşkirina vê dest pê dikin û ev şer herî zêde zirarê didin

jinê. Yanî di warê demê de jî girîngiya pêngavê zêdetir derdikeve holê. Helbet, jixwe di daxuyaniya pêngavê de jî rastiya Şerê Cîhanê yê Sêyemîn hebû. Di nav vê şerî de, wekî jin em ê çawa mudaxaleyî vê pêvajoyê bikin? Di hemû şerên cîhanê û şerên herêmî de jin her tim di pozîsyoneke pasîf de tê qetilkirin. Aliyê şerê kî dibe bila bibe, ferq nake; di rastiye de yê ku di nav vê şerî de herî zêde zulmê dibîne û berdêlên herî giran dide jin û zarok in. Gelek mînak dikarin werin dayîn. Em dikarin şerê li Sûdanê, şerê Filistînê mînak bidin. Îro li Kurdistanê, li Helebê pêvajoyeke şer hat jiyîn. Li Rojava... îro Kobanê di bin dorpêç û ambargoyê de ye. Li wir jî jin û zarok beşên ku herî zêde berdêl didin in. Em li Ûkraynayê jî binerin wisa ye. Li ku derê şerê hebe, mînak şerê Afganistan-Pakistanê; hem di wateya qetilkirina fîzîkî de hem jî di wateya pîrsgirêkên ku şer diafirîne de aborî, tenduristî, xizanî û di encamê de zêdebûna fûhûşê, koçberî jin berdêlên herî mezin didin.



Ji ber vê yekê, divê em vê pêvajoya şer bi vî rengî pêşwazî nekin. Bê guman li seranserê cîhanê rêxistinên jinan hene, pêkhatyên cuda yên li dijî şerê têdikoşin hene. Lê niha divê em bi awayekî rêxistinî û bi vîndarî, li dijî vê rastiya şerê sêyemîn, bêyî ku bibin alîgirê hêzên şerker ne hêzên derve jî yên herêmî... Ji ber ku her yek ji wan di pozîsyona perçiqandina jinê û di pozîsyoneke antî-demokratîk de ne. Em wekî jin divê li ku derê bisekinin? Li şûna girtina aliyekî serdest, divê em wekî hêzên ku têkoşîna azadiya jinê didin, vîna xwe ya serbixwe nîşan bidin û li cîhekî wisa bisekinin ku dawî li van şerên serdestiyê tîne, hêza xwe ya xweparastinê û vîna xwe ya rêxistinbûnê derdixe pêş. Lewma "Niha dema jinê ye". Vîna mîr-serdest her tim alîgiriye ferz dike. Jin li vir di pozîsyona aliyê ku dawî li van şeran tîne û vîna aştiyê ya xweparastinê û rêxistinîyê derdixe holê de ye. Em di pozîsyona aliyê "Rêya Sêyemîn" û xeta azadiyê de ne. Ev sekneke pîr girîng e, bi taybetî li Ro-

Her tim di bin zexta serdestiya mîr de, îdeolojiya wî, artêşbûna wî, siyaseta wî û rastiya wî ya ku jiyane bi giştî dorpêç kiriye... Em ji vê "re dibêjin "kujerê kastîk

**Lê niha divê em bi awayekî
rêxistinkirî û bi vîndarî,
li dijî vê rastiya şerê
sêyemîn, bêyî ku bibin alî-
girê hêzên şerker ne hêzên
derve ne jî yên herêmî...
Ji ber ku her yek ji wan di
pozîsyona perçiqandina
jinê û di pozîsyoneke antî-
demokratîk de ne**

jhilata Navîn. Wekî jinên Kurd, Ermenî, Suryanî, Ereb, Tirkmen, Laz û hemû jinên li Rojhilata Navîn dijîn, divê em vê rastiya baş bibînin û "Eniya Aşitiyê ya Jinan" û "Eniya Azadiyê ya Jinan" ava bikin.

Helbet, em vê wekî pêngavan îfade dikin. Taybetmendiya pêngavan çi ye? Pêngav, hinekî din komkirina enerjîyê ye. Me ev pêngav wekî pêvajoyeke salekê diyar kir, lê em nikarin bibêjin "Me têkoşîn an avakirin di salekê de kir û qediya". Armanca esasî li vir çi ye? Pêşxistina hişmendiye, bi ruhê pêngavê li ser xebatên rêxistinbûnê sekinîn, pêşxistina çalakiyan û fêmkirina serdema ku em tê de ne.

Derbasbûna ji qonaxa negatîf ber bi qonaxa şoreşa pozîtîf", bê guman di warê têkoşîna jinê de aliyên wê yên nîqaşê yên kûr hene. Lê niha Rêber Apo bi pêşxistina vê pêvajoyê re, dixwaze pêşiya tundiyê bigire û bala me bikişîne ser avakirinê. Mînak, avakiri-

na tiştên ku nîn in; heger jin ne xwedî gotin be, wê bike xwedî gotin. Heger rêxistinîyek nîn be, wê ava bike. Heger çalakî kêmbin, wan zindî bike. Pêngava KJK'ê jî armanc dike ku ev pêvajoya avakirina pozîtîf serkeftî bibe.

Mînak, em dixwazin vê hişmendiye biafirînin: Dawîanîna li tundiya li ser jinê, perçiqandin û mêtîngeriya li ser jinê... Em hezar û yek pirsgerêk dijîn; ji tundiya malbatê bigirin heta ya kolan, kargeh, dibistan û her derê. Em van her tim îfade dikin, lê em ê van pirsgerêkan bi awayekî mayînde çawa çareser bikin? Şêwazê rêxistinbûna çareseriya mayînde çi ye? Bi avakirina kîjan rêxistinan, bi kîjan dirûşman û bi kîjan rojeva jinê em dikarin tundiyê kêmbikin û tune bikin? Ji bo vê, argumanên têkoşîna zayendî ya li dijî mêr çi ne? Di nav malbatê de, di dibistanan de divê em kîjan têkoşînê bimeşînin? Giring e ku em van bi awayekî sistematîk, bi plan û bername bikin rojev. "Avakirina pozîtîf" vê yekê îfade dike. Heger em çavkaniya tundiyê û sedemên wê yên rastîn bi perwerde û hişmendiye nas bikin, em dikarin bi avakirina rêxistinîyên xurt pêşiya tundiyê bigirin.

Çavkaniya şer û mîlîtarîzmê jî di vê tundiya mîlîtarîst a li dijî jinê de ye. Ferq nake ew mêr hevser e, evîndar e, polîs e an leşker e... Tundiya ku dimeşîne mîlîtarîst e. Çavkaniya xwe ji pergala dewletparêz û kapîtalîst a mêr-serdest digire. Niha pirs ev e: Em ê çawa pêşiya vê bigirin? Ev yek ji "milkê mêr" dîtina jinê tê. Nexwe, jin dê çawa bibe ya xwe? Me got "Dema jinê ye";

Çavkaniya şer û mîlîtarîzmê jî di vê tundiya mîlîtarîst a li dijî jinê de ye. Ferq nake ew mêr hevser e, evîndar e, polîs e an leşker e... Tundiya ku dimeşîne mîlîtarîst e. Çavkaniya xwe ji pergala dewletparêz û kapîtalîst a mêr-serdest digire

berê dem ne ya jinê bû, hebûna wê ne ya wê bû. Em dikarin bi kîjan rêxistinîyan dema xwe biafirînin? Li vir "komûn" pir girîng e. Me di deklerasyona xwe de jî nivîsand; me got "Niha dema jinê ye, niha dema avakirinê ye". Dema em dibêjin dema avakirinê ye; jin divê rêxistinên ku wê bikin xwediyê xwe ava bike. Ev jî rêxistinîya komûnê ye.

Gava em lêkolîn dikin, em dibînin ku dema jin bi civaka xwe re di nav yekparebûnê de bû, dema "komûnal" bû, çanda Xwedawendiyê jîyan kir. Nexwe, avakirina komûnên me pir

girîng e. Pirsgirêkên aborî hene? Em bi komûnan xwe xurt bikin. Pirsgirêkên tenduristiyê hene? Li ser bedena me mudaxale hene? Bi navê "bedewkirinê" bi dehan operasyon têne kirin lê ev tenduristîya jinê xira dike, jinê bi pergale ve girêdayî dike. Nexwe, em komûnên xwe yên bedewiyê ava bikin. Çima em xwe li gorî pîvanên pergala mêr-serdest bedew bikin? Çima aboriya me bi mêr ve girêdayî be? Em komûnên xwe yên aborî ava bikin.

Di banga duyemîn a 27ê Sibatê ya Rêber Apo de nirxandinek li ser vê mijarê jî heye. Dibêje; "Di avakirina pozîtîf de armanc ne desteserakirina sazî an avahiyekê ye. Armanc ew e ku her kes bigihîje berpirsiyariya civakî. Armanc avakirina bi civakê re û di nav civakê de ye." Yanî ev di xeta gotinên we de ye; li şûna desteserakirina saziyên heyî, avakirina saziyên xwe yên alternatîf...





Erê, yanî ev ji bo pirsgirêka Kurd jî wusa ye; ne cudaxwazî ne jî nêzîkatiya asîmîlasyonîst. Wekî ku te got, di felsefeya entegrasyonê de; ne parçekirina ya heyî, ne jî tevlîbûna tê de wekî xwe. Tu di nav civakê de dema xwe ava dikî. Em li giravekê najîn, jinan di nav vê civakê de xwe ava kirin û dê bi têkoşîna civakî ava bikin. Ev derketina ji şêwazê jiyana kevin e. Li vir,

afirandina dema xwe, felsefeya xwe û xeta azadiyê bi civakê re bi rêya komûnan pêk tê. "Komûnbûn" ev e.

Siyaset çi ye? Rêbertî dibêje "Siyaset hunera hilberandina çareyan e". Ji bo jin û civakê, afirandina çareya xwe siyaseta wan e. Jin komûna xwe ava dike; li ku derê pêdiviya wê hebe, li taxê, di nav malbatê de, bi zarok û hevserê xwe re, li dibistanê, li kargehê... bi vê avakirina komûnal siyaseta xwe ava dike. Ji ber vê yekê em nikarin têkoşîna jinê bê si-

yaset û bê hişmendiya îdeolojîk bigirin dest. Cihê ku em lê winda dikin li ku ye? Yan em pir îdeolojîk nêzîk dibin û aliyê polîtîk nabînin, yan jî pir polîtîk nêzîk dibin û aliyê îdeolojîk rêxistin nakin.

Bi vê pêngava KJK'ê, re em pêngava "polîtîkbûn-îdeolojîkbûn" û avakirinê pêngava pozîtîf pêk tînin. Em bi vê yekê "Entegrasyona Demokratîk" û

"Civaka Demokratîk" a ku Rêber Apo di banga 27'ê Sibatê de diyar kiribû, xwedî lê derdikevin. Ji ber ku avakirina jinê, di heman demê de hûnandina civaka demokratîk e. Di heman demê de em vê pêvajoyê bi azadiya Rêber Apo ve girêdayî digirin dest. Armanca me bi pêngava avakirinê, çalakî û hişmendiye, bi ser ketin û azadiya Rêbertiyê ye.

Em her tim pergala kapîtalîst dinirxînin. Em dibêjin bi pergala kapîtalîst re hişmendiya baviksalar û tundî gi-

hîştiye lûtkeyê. Mînak jî li ber çavan in. Belgeyên Epstein nîşan didin ku ev ne tenê çend kes in; ev rastiyeke pergale ye ku rêvebirên siyaseta cîhanê, navên civakî, xwediyên xelata Nobelê, zanyar, qiral, qiralîçe û prens tê de ne.

Em weke şoreşger, derdorên ku têkoşîna azadiyê ya jinê dimeşînin em ji ku lê dinihêrin? Ev hovîtî ye, ev nîşaneyên têkçûn û bêexlaqîya sîstema kapîtalîst e. Bû eynika herî şênber a vê yekê. Bi temaşekirina li vî dîmenî re em çî dibînin? Divê em têkoşîna xwe hîn bêhtir mezin bikin. Pêwîst e em têkoşîna azadiya jinê hîn girîng bibînin, xurtir bikin, bi rêk û pêk bikin, vê têkoşîna polîtîk hîn xurt bikin. Yê ku polîtîkayên dimeşînin ku qaşo «rêzdar» bûn, raxist pêş çavan ku ev rêzdarî çiqasî bêexlaqî ye. Polîtîka ji aliyê kê ve tê meşandin, siyaseta cîhanê ji aliyê kê ve tê meşandin; mêr ên ku sîstema welatan, netewe dewletan dimeşînin û hin jin, ev hêzên desthilatdariyê kî ne, çî ne, li pişt wan çî hovîtî, komkujîya zarokan heye, her ku me ev dît; hişmendiyeke bi vî rengî derkete holê.

Wê demê divê em têkoşîna îdeolojîk û polîtîk a jinê hîn bêhtir xurt bikin û bimeşînin. Divê em vê têkoşîna polîtîk hîn bi rêk û pêk bikin. Bala xwe bidinê, zincîrek heye. Bi bertîlê, bi nelirêtiyê, bi şantajê ev hemû bi hev re, bi têkiliyên xwe yê qirêj weke zincîrekê bi hev ve girêdayî ne. Ji aliyê cografîk ve jî ji Rojhilata Navîn heta bi hemû parzemînan, Emerîka, Ewropa, Asyayê kesên li nava hemû dewletan tevî vê qirêjiyê bûn. Rastiyeke bi vî

Li ser bedena me mudaxale hene? Bi navê "bedewkirinê" bi dehan operasyon têne kirin lê ev tenduristiya jinê xira dike, jinê bi pergale ve girêdayî dike. Nexwe, em komûnên xwe yê bedewiyê ava bikin. Çima em xwe li gorî pîvanên pergala mêr-serdest bedew bikin? Çima aboriya me bi mêr ve girêdayî be? Em komûnên xwe yê aborî .ava bikin

rengî ya sîstematîk heye. Li hemberî vê yekê em nikarin tenê bi feraseta civaka sivil û komelbûnê têkoşîna bimeşînin. Bi esasî divê em vê rastiye bibînin û têkoşîna jinê di asta navneteweyî de bigihînin asteke gelekî cidî. Hem di asta herêmî hem jî di asta navneteweyî de divê em rojeveke hevpar biafirînin û li dora vê rojeva hevpar de çalakiyan lidar bixin, helwestê nîşan bidin.





Îbrahîm Êzîdî

Dîroka Gundê Barê Gêdûka Xerbî û Destana Simoqiyan

Li ser lûtkeyên Çiyayê Şengalê, li her devera ku lê mêze dikî, şopên berxwedaneke hezar salî û dengê qêrîna fermanan tê bihîstin. Yek ji van deverên herî bi heybet ku di dîroka gelê me de cihê xwe girtiye, gundê Barê ye. Dema ku em behsa Barê dikin, di rastiyê de em behsa nasnameyekê dikin ku li hemberî tarîtiyê qet serê xwe netewandiye. Stranên gelerî yên Şengalê ku di dilê dîrokê de cih girtine, bi salan e vê berxwedanê di nava civakê de zindî dihêlin. Kilama ku dibêje "Ezê ketime Silsila Çêlmêra

diyarî Sûkê, 3 bêlûkê eskerê Firîq Paşa ketina aliyê Gêdûkê", ne tenê stranek e; ew bîreweriya fermaneke mezin e ku di sala 1892'an de ji aliyê Dewleta Osmanî ve hatibû destpêkirin.

Di wê serdemê de, Emer Wehbî Paşa ku wekî Firîq Paşa dihat naskirin, bi fermana qirkirina Êzdiyan hatibû erkdarkirin. Çiyayê Şengalê careke din bûbû stargeh û qada şer a rûmetê. Her çend li gundê Bekira û li gelek deverên din berxwedanên bêhempa hatin kirin jî, gundê Barê ku wekî



Gêdûka Xerbî tê nasîn, bûbû keleha ku tifaqa neyaran lê dişkest. Milhimê Elî Axa, ku wê demê serokatîya eşîra Simoqî dikir, bi dengê tifinga xwe û bi biryardariya gelê xwe, bersiveke dîrokî da agirê ku Firîq Paşa berdabû dinyayê. Ev berxwedan wekî mîrasekî ku ti carî kevin nabe, îro jî di bîra her Şengaliyekî de geş e.

Ji bo ku em wateya kûr a vê berxwedanê û gundê Barê fêm bikin, divê em çavên xwe li dîroka eşîra Simoqî bigerînin ku xwediyên eslî yên vê axê ne. Rêwîtiya vê eşîrê bi xwe jî wekî romaneke koçberî û têkoşînê ye. Di serdema Sofeyê de, Simoqî ji Bakûrê Kurdistanê koçberî herêma Êrîvanê dibin û demeke dirêj li wir jiyana xwe didomînin. Lê belê, daxwaza vegera ser kokên xwe û berfirehbûna Mîrîtiya Êzidiyan li Başûrê

Piştî komkujiya li gundê Xetarê, eşîra Simoqî ji bo parastina hebûna xwe berê xwe dide Çiyayê Şengalê. Rêwîtiya wan a li nava Şengalê jî bi hêsanî derbas nabe; ji gundê Raşid ber bi Yosiva ve, ji wir ber bi Helêqê û di dawiyê de ber bi Kora Simoqê û gundê Barê ve diçin

Kurdistanê, wan careke din dikişîne ber bi axa pîroz ve. Di dema Mîr Elî Begê Dasinî de, ew li nêzî Hewlêrê, li devera Keleka Yasîn Axa ku ser bi navçeya Soran ve bû, bi cih dibin. Lê dîrok jî bo Êzidiyan her tim bi ceribandînen giran tije bûye. Di sala 1832'an de, dema ku Mîrê Kor (Mîr Mihemêdê Rewandûzî) êrîştî Mîrge-





ha Şêxan kir, yek ji tarîtirîn rûpelên dîrokê hat nivîsandin. Di wê fermanê de ku 70.000 Êzidî hatin qetilkirin û Laleşa Nûranî hat şewitandin, Simoqiyana careke din rûyê qirkirinê dît. Piştî komkujiya li gundê Xetarê, eşîra Simoqî ji bo parastina hebûna xwe berê xwe dide Çiyayê Şengalê. Rêwîtiya wan a li nava Şengalê jî bi hêsanî derbas nabe; ji gundê Raşid ber bi Yosiva ve, ji wir ber bi Helêqê û di dawiyê de ber bi Kora Simoqê û gundê Barê ve diçin. Ev gund dibe warê wan ê dawî û yê herî bi rûmet, ku lê Milhimê Elî Axa di sala 1892'an de li dijî Firîq Paşa sîngê xwe kiribû mertal.

Wateya navê "Barê" bi xwe jî bi erdnîgariya wê re girêdayî ye. Hinek dibêjin ji ber ku ev gund li ser rîya Geliyê Şîlo ye ku ber bi Bakurê Çiyê ve diçe, navê "Ber-rê" (li ber rê)

girtiye. Hinekên din jî diyar dikin ku ji ber av û xwezaya wê ya dewlemend, wekî cihekî geştiyarî û bêhnvedanê hatiye binavkirin. Lê îro, ji bilî wateyên etîmolojîk, Barê wateya berxwedanê dide. Dema ku di sala 2014'an de çeteyên DAÎŞ'ê bi hovîtiê êrîşî Şengalê kirin, dîrokê xwe dubare kir. Barê careke din bû qada herî dijwar a şer. Li vê derê, gerîlayên azadiyê û şervanên Êzidî li dijî nûnerên tarîtiyê yê sed sala 21'an sekinîn. Ji ber ku li vir xwîna gelek qehremanan hat rijandin, êdî ji Gêdûka Xerbî re dibêjin "Geliyê Şehîdan". Ev gelî bîranîna herî zindî ya wan ciwanan e ku nahêlin Şengal bikeve. Tevî ku îro gund ji aliyê rûniştina mayînde ve vala ye jî, di demsala biharê de malên xwedî pez û rezvanên Simoqî vedigerin ser vê axê. Ew xaniyên heriyê yê ku bi mîmariya xwe ya

resen bala mirov dikişînin, her çend bêdeng bin jî, di nava dîwarên xwe de çîrokên hezaran salan vedişêrin.

Mixabin, siyaseta qirkirin û bişaftinê tenê bi fermanên leşkerî sînordar nemaye. Di sala 1975'an de, rejîma Baas a Iraqê ji bo ku pêşî li piştgiriya eşîra Simoqî ya ji bo pêşmergeyên Mistefa Barzanî bigire, biryara valakirina gund da. Bi vê biryara siyasî, hemû eşîr bi darê zorê ji Barê hatin derxistin û di komalgeha Digurê de hatin bicihkirin. Ev koçberiya bi darê zorê birîneke kûr di dilê Simoqiyan de vekir, lê peywendiya wan a bi axê re qut nekir. Îro jî, her çend rûniştina li gund ne wekî berê be, xwediyên rez û baxan nahêlin ku keda bav û kalên wan hişk bibe. Her bihar, jiyana careke din li Barê şîn dibe. Dema mirov li nava kolanên vala yên Barê digere, tenê dengê bayê ku li nava

Barê, ne tenê gundekî li rojavayê Çiyayê Şengalê ye; ew pirtûka dîroka me ye ku bi xwîn, keda destan û bi stranên Milhimê Elî Axa hatiye nivîsandin

geliyan dixê û bîhna darên fêkiyan dibhîse. Ew xaniyên heriyê yên ku bi kedekê mezin hatine avakirin, îro bûn mîras û remza berxwedana eşîra Simoqî. Barê, ne tenê gundekî li rojavayê Çiyayê Şengalê ye; ew pirtûka dîroka me ye ku bi xwîn, keda destan û bi stranên Milhimê Elî Axa hatiye nivîsandin. Heta ku bîranîna Gêdûka Xerbî di dilê me de hebe, agirê berxwedana Barê dê tu carî venemire.



Tevgera Ciwana ya Şengalê

Werzîş rêbazekî parastina cewherî ye

Em dema li civaka Şengalê dimeyzînin, civakekî xwedî çand û exlaqê dibînin. Civakekî ku di cewhera xwe de çandekî kevnar dihewîne û di roja me ya îro de ruxmê hemû êrîşên ji milê modernîteya kapîtalîst ve, her di hewldana parastina vê yekê de ye. Spor û werzîş jî rêbazekî parastina cewherî îfade dike, rêbazek e ku civak karibe xwe ji êrîşan biparêze. Mirov dikare wekî refleksa civakê li beramberê êrîşan jî pênas bike. Li ser reya medya dijital hewldana qelandin û tinekirina civaka Şengalê tê kirin û di heman demê de êrîşên mezin li ser exlaqa civaka Êzidî

hene. Bi pêşxistina çand û werzîşê, ne qebûl kirina vê yekê xwe dide der û hewldana parastina jiyana xwe ya komînal diyar dibe.

Li Şengalê meraqekî pir mezin a ciwanan ji bo çalakiyên werzîşê hene. Mirov li gelek gundan dibîne ku herî zêde mijûlbûyîna ciwanan bi tayira (voleyball) yan tapê (football) heye. Di heman demê di van aktîvîteyan de afirîneriya wan ciwanan derdikeve holê, ji bê derfetbûnê



di nava kar û xebatên ciwanan de werzîş beşekî esas e ji bo pêşxistina kar û xebatên xwe. Ji milekî ve hemû ciwanan tîne gel hev û rihekî hevpar ava dike û ji milekî din ve jî nahêle ku sîstema kapîtalîst ciwanan ji cewhera xwe dûr bixe

avakirina derfetan di her gund û taxekî de diyar dibe. Ji ber li her gundî dibe ku sehayê tayîra yan tapê nebe, lê li her taxekî mirov dibîne ku ciwan ji xwe re sehayekî çêkirine. Di van leyistokan de rihekî hevpar jî derdikeve pêş, di esas de di cewhera Ezdayetiyê de jiyana komînal

esas e û komînalbûn ango hevparbûn bingeha jiyane îfade dike. Leyistokên wekî tayira û tapê jî leyîstokên komînal in, hemû pêkve dileyizin. Ji ber vê yekê di nava kar û xebatên ciwanan de werzîş beşekî esas e ji bo pêşxistina kar û xebatên xwe. Ji milekî ve hemû ciwanan tîne gel hev û rihekî hevpar ava dike û ji milekî din ve jî nahêle ku sîstema kapîtalîst ciwanan ji cewhera xwe dûr bixe. Spor dihêle ku di ciwanan de asoyekî fireh pêşbikeve.

Mirov di dewreyan an di nava jiyana ciwanan de jî dibîne ku nêzîkatî li beramberê spor û werzîşê pir bi dîsîplîn e, vê yekê hezkirina ciwanan îfade dike, ji ber îstîqrar heye. Lêgerîn û xwesteka fêrbûnê bilind dibe, fêrbûn û ji xwe bawer bûn di ciwanan de zêdetir dibe. Bi vî awayî di ciwanan de afirînerî pêşdikeve, ji ber keda ku tê dayîn armanca xwepêşxistinê xurttir dibe. Û di heman demê de pêşeroja xwe dîtî jî bi vî awayî zêdetir dibe.

Mirov dikare bêje ku kesayetekî bi tendurîst di ciwanan de ava dike, meyzandin û nêzîkatiyekî bi armanc jî jiyane re çêdibe. Ji ber armanca pêşxistina kar û xebatên sporê, dûrxistina ciwanan ji valatî û jiyane

em di kar û xebatên xwe de girîngî didin xwestek û lêgerînên ciwanan û dixwazin kar û xebatên werzîşî xurtir bikin, ne li ser esasê maddiyatê, li ser esasê jiyana û rihekî komînal.

pûç û vala ye. Bêçaretîya ciwanan dihêle ku biryarên şaş ango jiyane pûç were jiyana kirin, ev jî di esas de ev xwesteka sîstema kapîtalîst e. Bi şerê taybet, avakirina dîmenekî xirab li ser spor û çandê heye. Sîstema kapîtalîst bi taybet li Şengalê dixwaze bi amûrên xwe yê şerê taybet ciwanan ji kedê û ji jiyane dûr bixe, dixwaze ku ciwan valatî û bêhêvîti bijî. Di heman demê de dixwaze civakê ji manewiyatê jî dûrbixe an jî hesta manewiyatê tîne bike. Di xwezaya civaka Şengalê de manewiyatekî pir kûr heye, hezkirina civak û koka xwe heye. Bersiva vê yekê mirov tenê dikare bi avakirina jiyane bi armanc û bi wate bide, ji ber vê yekê em di kar û xebatên xwe de girîngî didin xwestek û lêgerînên ciwanan û dixwazin kar û xebatên werzîşî xurtir bikin, ne li ser esasê maddiyatê, li ser esasê jiyana û rihekî komînal. Werzîş ne tenê xwedî bandora fîzîkî û bîyolojîk e, di heman demê de mirovan kêyfxweş dike û bi xwe baweriyê jî zêde dike. Di heman demê de bandora xwe li ser rihê însan jî hene, ev di ciwanan de pir girîng e ji ber ku ciwan herikbar in, enerjîyekî bêdawî ku her di nava herikandinekî de ye.



Êrîşa ku 15.6.2023 li ser Meclîsa Gel a Sinûnê pêkhat

Dema êrîş pêk hat ez bixwe jî li cihê bûyerê bûm, yek ji bîrîndaran jî ez bûm. Di heman demê de ez endamekî meclisê me jî. Li gor ragihandina xêrnex-



Xelef Feqîr

waz û ya dijmin, hin partiyên sîyasî jî di nav de wek ku armanc û sedema êrîşê dan diyarkirin rastiyekek xwe nîne, ne bi wî rengî bû

Weke tê zanîn meclis cihekî gel e, cihê kombûna civakê ye, mirovên medenî û mirovên taxê ne, der û cînar in. Wisa wek ku tê gotin kesên xerîb ku ji derve werin, millet kom bikin û civîna li dar bixin nîne, ev gotinên ne rast in û bê bingeheke in, yek jî polîtîkayên şerê taybet in. Armanc û hedefên wan çav tirsandina civakê bû, bi vî awayî dîrxistina ji saziyên xwe bû. Belavbûn, parçebûn, civakek bê rêxistinkirî û bê perwerde, li gor berjewendiyên xêrnexwazan e. Ev şêweyê erîşê jî yek ji rêkên gihiştina armancên xwe ye ji bo wan.

Roja êrîş pêk hat jî wisa dîsa millet li meclisê rûniştîbûn û wek her tim di nav hev de niqaşên jiyanî dikirin. Em nêzî hef-heşt kes bûn, bi carekê re em bi teqînekê hejyan û me xwe di nav şehîd û birîndaran de dît. Dû şehîd hebûn, birîndar hebûn, yek ji wan şehîdan zarok bu, Şehîd Salih, emrê wî deh-yanz-

deh sal bû hîna, talebeyek medresê bu, Zarokek bê sûc û gûneh bû. Yek jî Şehîd Îbrahîm bû, hem xwarzê min bû, hem hevalê min bû, em mirovên hev û ji eşîrekê bûn. Însanekî hêja bû, xizmeta milletê xwe dikir, zerara wî bi kesî nebû

Dixwestin pêşî li vegera gel bigirin

Bêwar bin, her dem li ser riya bin, qala siyasetê nekin, doza maf û azadiyê nekin, tim li ber destê hinekan kole bin, bê parastin bin, pê perwerde û nezan bin, belave bin. Armancên dijminê me ev in. Ya din jî, ji holê rakirina ol, bîr û baweriya Êzîdiya ye. Me got, yek jî çav tirsandina millet bû, ji ber ku di wan deman de millet carek din berê xwe dabûn Şengalê, ber bi axa xwe

ve dihatin, berê xwe dabun ser cîh û warê xwe, ji qampa derdiketin û hatin gelek zêde bû. Bî vî awayî, bî êrîşên bi vî rengî dixwestin pêşî li hatina millet bigirin. Ji bo ku carek din civaka Êzîdî ku di bin qetlîamek ewqas hovane re derbas bû, bi vî awayî birîndarmayî ber bi belavbûn û tinebûnê ve biçê, carek din neyê gel hev û xwe komî ser hev neke, sedemek girîng a êrîşê jî ev bû

Dijminê me ji berê de dixwaze ku em tim kole û di bin emrê wan de bin, nekaribin xwe bi rêve bibin serbilind û azad bijîn. Em ji berê de bigrin dest kîjan îrada milletê Êzîdî dihat qebulkirin, dijmin çi qîmet didanê ku piştra hinek din hatine û jê girtine? Ji bo wê jî ev tiştek ecêb e li ba dijmin, ku çawa





miletê Êzîdî dikare li ber xwe bide, dijmin nikare vê yekê qebûl bike. Bi taybet kesayetên pêşeng, welatparêz, xemxûrê milletê xwe ji xwe re dikirin hedef, van derbên giran lê didan ku millet gav paşde bavêje! Li mafê xwe negere, behsa hiqûqa xwe neke. Bi sedan sala ye ku Êzîdî wek millet nayên dîtin, ne heqê wan ne jî hiquqê wan tê naskirin, li beranberî vê berxwedana milletê Êzîdî jî qebul nakin, ev di bin çî navî de dibe, bi çî hincetê dibe bila bibe

Qey berê PKK li vir hebû?

Beriya fermana 2014'an, dema BDAÎŞ'ê êrîşî Êzîdiyan kir, keç û jinên Êzîdî revandin û zarok kuştin qey wê demê jî PKK li Şengalê bû?

Qey dema 2007'an teqîna ku li Sîba û Til Ezêr çêbû, hezar însan bi kuştî û briîndaran ku hina jî nehatiye zelalkirin, qey wê demê jî PKK li vir hebû? Wek me beriya niha jî got, hemû hincet in. Li gor wan em bê dîn û îman in, ne mirov in, divê me tine bikin, armanc tinekirin e. Lê wê ti carî negihîjin armanca xwe heta ku yek Êzîdî jî hebe. Rast e Êzîdî şehîd didin, êsîr dikevin dest, lê ti carî wê serî daneynin. Bi hezaran sala ye Êzîdî li hember êrîşan bi berxwedanê hatine van rojan. Ji ber Êzîdî qewmek e, miletek e, ne wek binemalek an eşîrek e, yan çend şexsên ku ji bo malê dinyayê dev ji Êzdatiyê berdin, tiştêk wisa nîne



Dr. Devrîm Alp

Vîrûsên Herî Girîng

HIV

HIV

Li vir vîrûsa kêmasîya immuni ya mirovan (HIV) tê dîtin; ev retro-vîrûsek e ku bi awayekî rasterast êrîşî sîstema parastina laş dike, bi taybetî hucreyên T yê CD4-pozîtîv (CD4+ T lîmfosît) dike. Di wêneyê de vîrûs bi şiklê gur hatiye nîşandan û li ser rûyê wê glîkoproteînên rûyê erdê (surface glycoproteins) hene ku fonksiyona wan ew e ku bi reseptorên li ser rûyê hucreyên mêvandar li verê xwe .girê didin, bikevin hundirê hucreyê û wê enfekte bikin



Influenza

Influenza

Li vir em vîrûsa îNFLUENZA (vîrûsa gripê / serma-sarê) dibînin, ku sedema nexweşîya gripê dike. Vîrûs xwedî avahiyeke girover / seferîk e û li ser rûyê xwe du cure proteînên rûyê erdê hene: hemagglutinin (HA) û neuraminidase (NA). Ev her du proteîn ji bo enfeksiyonê pir girîng in û ji bo dabeşkirina cureyên cuda yê vîrûsê tene bikaranîn (mînak H1N1, H3N2 (û hwd



Herpes Virus

Herpes Virus

Vîrûsa herpês a ku li vir tê dîtîn, endamê malbata Herpesviridae ye ku gelek nexweşiyên cuda çêdike, wekî herpes simplex (birînên li dev an organên zayendî) û varicella-zoster (serm-sarê mirîşkan û zoster / şingles). Struktura wê ji van qatan pêk tê

,(**Core** / navika **DNA** ya ducar-şax (double-stranded DNA Kapsîda îkozahedral (şiklê pirgoşeya 20 rû, T=16), ku DNA diparêze

Tegument (qata proteînên navberî ya qelew, di navbera kapsîd û zêrfê de

Zerfa derve (envelope) ya ji lîpîdê ya mêvandarê hatiye wergirtin û li ser rûyê wê glîkoproteînên taybet hene ku ji bo girêdana bi hucreyên mêvandar û ketina hundir pir girîng in

Ev struktur dihêle vîrûs bikeve laş, xwe veşêre û nexweşiyên cuda çêbike



Ebola Virus

Ebola Virus


Ev nîgar vîrûsa Ebola nîşan dide, ku endamê malbata Filoviridae ye û bi şiklê xwe yê dirêj, fîlamentî an mîna têtê (thread-like/filamentous) tê naskirin – ev şikl ji piraniya vîrûsên din cuda ye. Vîrûsa Ebola sedema nexweşiya Ebola (Ebola virus disease / EVD) ye, ku taya xwînrijandinê ya giran û pir caran mirinbar e (hemorrhagic fever) di mirov û hin primatên wekî gorîl û şempanzeyan de çêdike. Vîrûs bi awayekî pir xeternak e û rêjeya mirinê di hin derketinan de pir bilind e



Hepatitis B

Hepatitis B

Vîrûsa Hepatît B bi şêweya xwe ya taybet, bi şikla topî tê nîşandan. Ev vîrûs ji malbata Hepadnavîrûsan e û organê kezebê enfeksiyon dike, ku dikare hepatîta akut û kronîk çêbibe. Antîjena rûyê wê (HBsAg) nîşaneke girîng e ku di testên teşxîsê de tê bikaranîn. Ev vîrûs bi rêyên cuda (xwîn, têkiliya zayendî, ji dayikê bo zarokê, derziyên qirêj) tê veguheztin û di rewşa kronîk de dibe sedema zirara demdirêj a kezebê, sîrozê û kansera kezebê. Ji ber vê yekê vaksîna Hepatît B yek ji awayên herî bi bandor ên pêşîlêgirtinê ye û li gelek welatan ji zarokan re di sala .yekem a jiyane de tê çêkirin



Hepatitis B

Rabies Virus

Rabies Virus


Ev nîgar vîrûsa kudatê (Rabies virus) nîşan dide, ku bi şiklê xwe yê taybetî yê **mîna gulekê** (bullet-shaped) tê naskirin. Vîrûsa kudatê endamê genus **Lyssavirus** (ji malbata Rhabdoviridae) ye û sedema nexweşiya **kudatê** ye – nexweşiyeye demarî ya pir xeternak û hema hema her tim mirinbar e, ku hemû memikan (mirov û heywanên germxwîn) bandor dike

:Struktura wê ya morfolojîk ev e

Şiklê wê **elongated / bullet-like** e (dirêj û yekalî, bi qasî .(180 nm dirêj û 75 nm fireh

Xwedî **zerfeke lipidî** (envelope) ye ku li ser rûyê wê glîkoproteînên **G** (glycoprotein G) hene – ev proteîn ji bo girêdana bi hucreyên mêvandar û ketina hundir pir girîng .in

Di hundir de **RNA-ya yek-şax** (negative-sense single-stranded RNA) heye ku di nav **kapsîda helical** de ye. Ev şiklê taybetî yê vîrûsê yek ji taybetmendiyan herî girîng e ji bo teşhîskirina wê di laboratoriyê de (mînak bi mîkroskopa elektronî) û di dîroka vîrûsolojiyê de jî wekî .nîşana wê ya klasîk tê pejirandin




Rabies Virus

shutterstock.com - 709016404

Papillomavîrûs


Papillomavîrûsa Mirovî (HPV) komeke vîrûsan e ku pir belavbûyî ne û bi giranî **çerm û mukozayên laş** enfekte dikin. Zêdetir ji 200 cureyên HPV hene. Piraniya van cureyan xeternak nînin û bi xweber di nav çend mehan heta salekê an du salan de ji laşê mirov derdikevin. Hin cureyên kêmxeter dikarin **zîl an siğil** (warts, kondîlom) çêbikin, mînak li dest û pêyan, li herêma zayendî an jî li dora anusê. Lê hin cureyên xeternak (high-risk HPV) dikarin enfeksiyonên demdirêj çêbikin û bibin sedema guhertinên pêş-kanserî, ku di dawiyê de dibe sedema **kansera servîksê** (qalikê zikmakî) û hin kanserên .din ên girêdayî HPV



Bakteriyofaj


Bakteriyofaj (an jî bi kurtî faj / phage) vîrûseke taybet e ku tenê bakteriyên vegir dibe û dike. Ev vîrûs bi awayekî pir taybetî bi rûyê hucreya bakteriyê ve girê dide (bi alîkariya fiberên dûvikê), piştî materyala xwe ya genetîkî (bi piranî DNA-ya ducar-şax) derdixe hundirê bakteriyê. Piştî wê, makîneya hucreya bakteriyê tê bikaranîn da ku vîrûsên nû bên hilberandin. Di dawiyê de hucreya bakteriyê diqelişe (lîz dibe) û vîrûsên nû derdikevin derve da ku .bakteriyên din jî vegirin

Ev vîrûs di xwezayê de pir gelemperî ne û rola wan a mezin heye di kontrolkirina nifûsa bakteriyên de, û îro jî di dermanê nû (phage therapy) de ji bo şerkirina bakteriyên berxwedêr li hemberî .antîbiyotîkan têne lêkolîn kirin



Adenovîrûs

Adenovîrûs (an jî vîrûsên adeno) komeke vîrûsên ne-zerfî (non-enveloped) ne ku mirov û gelek cureyên heywanan vegir dikin. Ew bi gelemperî sedema enfeksiyonên rêyên jorîn ên nefesê dibin (wekî serm-sarê, bronşît, pneumonia di zarokan de), lê dikarin enfeksiyonên konjonktîvî (sor bûna çavan / pink eye), gastroenterît (îshal û vereşîn), sistît (enfeksiyona mîzê) û car caran nexweşiyên girantir jî çêbikin, nemaze li kesên xwedî pergala parastinê ya qels Belavbûn bi piranî bi rêya dilopên hewayê (aerosol / tröpfcheninfektion), têkiliya dest bi rûberên qirêj, an jî têkiliya rasterast pêk tê. Ev vîrûs di zarokan de pir gelemperî ne û gelek caran di nav komên .girtî (zarokxane, dibistan, leşkerî) de derdikevin Tendurist bimînin û xwe biparêzin





و هه‌تا نوکه ژى ل باشورى کوردستانى پيشمه‌رگه نه.

(پ. د. ك)، باژير بجه هيلابوون و ئيزدى جاره‌كا دى رويب روى فه‌رمانه‌كا دى كرابوون. ئه‌و په‌يفتين كو ب هه‌قبه‌شى ژلاى ئيزديان، پشتى كۆمكۆزىي دهاتنه بزار ئينان ئه‌فه بوون:

” (پ. د. ك) دگۆت، ’هه‌ر كه‌س بلا ل مالا خوه مينيته، پيدفى ناكه‌ت هوين بچنه جهه‌كى دى، ئه‌م دى وه پاريزين’. لى وان سوژا خوه جيبه‌جى نه‌كرن، ئه‌م نه‌پاراستين و وه‌كى كو مه د ناڤا ناگريدا بهيلن، باژير بجه هيلان و چۆن. خه‌لكى دشيا خوه رزگار بكه‌ت، دشيان خوه ژ ده‌فى فى كۆمكۆزىي بيننه ده‌رى، لى (پ. د. ك) رى نه‌دا، گۆت ئه‌م دى وه بپاريزين. به‌رپرسيارين فى كۆمكۆزىي (پ. د. ك) و ريفه‌به‌رين وى نه.“

هه‌كه ريفه‌به‌رين (پ. د. ك) ئه‌ف پشتراستيه نه‌دابانه ئيزديان، دا ئيزدى شين ل گۆرى ده‌رفه‌تين خوه ته‌دبيرين پيدفى وه‌رگرن. هه‌ما چنه‌بيت، ل به‌رامبه‌ر فى كۆمكۆزىي، دشيان كيم و زيده، بنه ئاسته‌نگ. ئيزدى، گه‌له‌كى شه‌رفان بوون، ئيزديين كو د ديروكى دا ب ده‌هان جاران هاتبوونه كۆمكوژ كرن، خوه‌دى ئه‌زموين شه‌ر و به‌رخودانان بوون و د مالىن خوه دا قه‌ت چ جاران چه‌ك ژ وان كيم نه‌دبوو. لى، ريفه‌به‌رين (پ. د. ك) يين كو گۆتن، ’پيدفى ب فى هه‌مويى نينه‘ پاشى ژى پشتا خوه دانه ئيزديان،

رى ل به‌ر مه‌زنتين كۆمكۆزىا سه‌دسالى، لسه‌ر ئيزديان فه‌كربوون. كه‌سين كو ئيزدى ته‌رك كرين و هيلينه ده‌هفى ناگريدا نه‌ بتنى (پ. د. ك) بوو، ب هه‌مان شيوه، ل هه‌مبه‌ر چه‌ته‌يين داعشى، هزاران له‌شكر و پۆليسين عيراقى ژى كو ل شنگالى بوون، ئيزدى هيلابوونه بتنى. له‌شكر و ريفه‌به‌ريا عيراقى ژى تيك ژ تاوانباران بوو. ب گۆتئا ئيزديان؛ به‌رپرسيارى هه‌ره مه‌زن ئه‌و بوون و دڤيت به‌رپرسيار ل هه‌مبه‌ر ديروك و جفاكى هاتبانه دادگه‌ه كرن. لى مخابن مه‌كانيزمه‌كا وسا به‌رچاف يا دادوه‌رى نه‌بوو.

د هه‌مان شه‌فى دا ١٢ گه‌ريلايين كو ب سالان بوو ل چيان بوون و د شه‌ران دا خوه‌دى ئه‌زموون بوون، هاتبوونه ئه‌ركداركرن و ب فه‌شارتى هنارتبونه شنگالى.

به‌لى، پشتى هاتنا داعشى، گه‌لهك ژ فان عه‌ره‌بىن سونى ته‌قلى داعشى بوون و ببونه هه‌قبه‌ش و هه‌فكارى كۆمكوژيا ئىزدىان. نه تنى عه‌ره‌بىن سونى، هندهك ژ 'تات'ى - عه‌ره‌بىن سونى و كوردىن ده‌وشيرمه يىن ل ده‌ولا دژيان ژى ببونه هه‌قبه‌ش و هه‌فكارىن قى كۆمكوژىي. پشتى فان هه‌مى بوويه‌ران، پڙقه‌به‌ريا (پ. ك. ك) بريا‌ره‌كا توند وه‌رگرتبوو و گوټبوو "ته‌م دى ئه‌ف شه‌فه‌ه ناڤه‌ينكارىي د شنگالى دا كه‌ين" و ده‌ست ب لڤين و خه‌باتان كربوون. د هه‌مان شه‌قى دا ۱۲ گه‌ريلايىن كو ب سالان بوو ل چيايان بوون و د شه‌ران دا خوه‌دى ته‌زموون بوون، هاتبوونه ئه‌ركداركرن و ب فه‌شارتى هه‌نارتبوونه شنگالى. يا راست ژ بلى (پ. د. ك) چ ئاسته‌نگى، ل پيشيا قى ئه‌رك و رىكرنا گه‌ريلايان نه‌بوو. ژ به‌ر (پ. د. ك) نه‌چار ما‌بوون ب دزىقه‌ ده‌رباز بن. ئىكه‌م ئه‌ركى وان پاراستنا ئىزدىين شنگالى و ب له‌زگىنى، پڙكخستن كرن و په‌روه‌ده كرنا ئىكینه‌يىن خوه‌پاراستنى بوو. ژ ۱۲ كه‌سین كو ب قى ئارمانجى چو‌بوونه شنگالى، ۳ ژ وان گه‌ريلايان ل سونى، يا شنگالى، ژ لايى (پ. د. ك) فه‌هاتبوونه گرتن و ئىخستبوونه گرتىگه‌هئ. داعش، گاف ب گاف شنگال دۆرپىچ كربوو. پشتى چهند پوژان ۳ گه‌ريلا هاتنه‌به‌ردان. چهند پوژان پشتى وى، (پ. د. ك) د ئىك جارى دا بريا‌ر دابوو هه‌مى پڙقه‌به‌رى و پيشمه‌رگين خوه‌ ژ شنگالى فه‌كيشيت. پيشمه‌رگه، هه‌روه‌ك چه‌وا ژ ڤايروسا وه‌بايى پره‌فن، ده‌ست ب په‌قى كربوون. گه‌لهك ژ وان، بىي كو تشتين خوه‌ يىن شه‌خسى دگه‌ل خوه‌ به‌ن، هه‌مى دىف خوه‌ هيلان و په‌فين. لى چه‌كين خوه‌ دگه‌ل خوه‌ برن. دگه‌ل وان هنده‌ك پيشمه‌رگين ئىزدى ژى په‌فیبوون. نه‌و ژى دگه‌ل كاروانين پيشمه‌رگان، ب مالباتين خوه‌ فه‌ ژ شنگالى په‌فیبوون

پيشمه‌رگين ئىزدى يىن كو به‌رى خوه‌ دابوونه ملئ باشورى كوردستانى، جاره‌كا دى فه‌نه‌گه‌ريانه شنگالى

عه‌ره‌بان تىك چو. ده‌مى عه‌ره‌ب دگه‌هشتنه خالين كۆنترۆلى، فه‌رماندارين پيشمه‌رگان، پڙنمايى ددانه پيشمه‌رگين ئىزدى كو ب چهندين ده‌مژميران عه‌ره‌بان ل خالين بشكنيان بده‌نه راوستاندن. هنده‌ك جارن ژنين دووگيان، ل خالين كۆنترۆلى يان ژى ل سه‌ر پڙيا نه‌خوشخانئ زارۆكىن وان ژبه‌ردچوون. سڤكاتى ل عه‌ره‌بان دكرن و قى تشتى كارفه‌دانين ناڤخوه‌يى يا د ناڤه‌را عه‌ره‌ب و ئىزدىان دا زىده دكر. (پ. د. ك)، ب زانا‌بوون ئه‌ف تشتى دكر و ئه‌ف كاره ب ئىزدىان ددا كرن. ب قى په‌نگى، مه‌گه‌لهك گوندين عه‌ره‌بان، كرنه دژمنى خوه. ده‌مى داعش هاتى، به‌هه‌ره‌ زىده فان عه‌ره‌بان دگه‌ل داعشى ده‌ستى خوه‌ تىكه‌لى كوشتنا مه‌ كرن.



هنده تشت هه‌نه حه‌رامن؛ بۆ نمونه، چه‌وا خوارنا خه‌س و که‌له‌میان ل ده‌ف ئیزدیان حه‌رامه، هه‌قالینیا (پ. د. ک) ژى ل ده‌ف ئیزدیان حه‌رامه. هه‌می که‌سى ژى دزانى، مه‌ ژبو وان دگوت 'داعش ل ده‌ردۆرا مه‌ یه' لئ ئه‌وان گوه‌ نه‌دا مه‌.» به‌رى (پ. د. ک) ل شنگالئ بیته ده‌سته‌لاتدار، د ناقه‌را گه‌لین شنگالئ دا چ شه‌ر و ناكوکى یین گرنگ، گریدایى ئولى و نه‌ته‌وه‌یى نه‌بوون. عه‌ره‌ب، سوریاى، تروکمان، شیعه -سونى و ئیزدی د ئاشتیى دا پیکفه‌ دژیان. لئ هه‌ر کو (پ. د. ک) ده‌ست ب سه‌ر ریفه‌به‌ریا شنگالئ داگرت، پشتی وئ ئالۆزى و کیشه‌یین جفاکى د ناقه‌را ئیزدی و عه‌ره‌بان دا ده‌ست پئى کرن.

ل هه‌مه‌به‌ر عه‌ره‌یین کو ژ خالین بشکینان کو لژیر کۆنترولا پیشمه‌رگان ده‌رباز دبوون، هه‌لوپسته‌کئ دژمانه‌ نیشا عه‌ره‌بان ددان. ب تابه‌تى، ل خالین کو پیشمه‌رگین ئیزدی لئ ب جه‌ ببۆن، عه‌ره‌ب، چه‌ندین ده‌مژمیران ده‌هاته‌ پراوستاندن و پئى نه‌ده‌هاته‌ دان ده‌رباز ببن. فئى چه‌ندئى توپه‌بوونا عه‌ره‌بان به‌رامبه‌ر ئیزدیان زیده‌ دکر. سه‌روکئ (پادئى) عه‌مه‌ر سالح فئى په‌وشئ ب فئى په‌نگى دئرخینیت:

”به‌رى هینگئ مه‌ چ کیشه‌ دگه‌ل عه‌ره‌بان نه‌بوون. لئ ده‌مئ (پ. د. ک) ل شنگالئ ده‌ست ب سه‌روه‌ریا خوه‌ کر و ئیزدیین دگه‌ل (پ. د. ک) ده‌ست ب پیشمه‌رگاتئ کرن، ناقه‌را مه‌ و

به‌رى (پ. د. ک) ل شنگالئ بیته ده‌سته‌لاتدار، د ناقه‌را گه‌لین شنگالئ دا چ شه‌ر و ناكوکى یین گرنگ، گریدایى ئولى و نه‌ته‌وه‌یى نه‌بوون. عه‌ره‌ب، سوریاى، تروکمان، شیعه -سونى و ئیزدی د ئاشتیى دا پیکفه‌ دژیان. لئ هه‌ر کو (پ. د. ک) ده‌ست ب سه‌ر ریفه‌به‌ریا شنگالئ داگرت، پشتی وئ ئالۆزى و کیشه‌یین جفاکى د ناقه‌را ئیزدی و عه‌ره‌بان دا ده‌ست پئى کرن.

»ئهم د ناقه‌ گه‌ل دا دگه‌ریاین. ئهم چۆبۆینه‌ گرزه‌رکئ. داعش ٥٠٠٦٠٠ مه‌تران، ل پیشبه‌رى مه‌ دگه‌ریا. ل ده‌روازا گونیدیا، به‌رى فه‌رمانئ کونه‌چاله‌کا بچویک ب حه‌فارئ هاتبوو کولان. هه‌قالئ هه‌مه‌ت - دیار غه‌ریب ژى هاتبوو شنگالئ. مه‌ ته‌له‌فۆنا (چرا ت.ف) کر و گازى کر به‌یین. د به‌رنامه‌کا (چرا ت.ف) دا، من گوت، «ئهم روبه‌پروى مه‌ترسیه‌کا مه‌زین». ئه‌ف پروگرام د ئارشیکا (چرا ت.ف) دا هه‌یه. هیزین داعشئ سونى ژى سه‌رژئ دکر، هزرا خوه‌ بکه‌ن، هه‌که‌ بکه‌فنه‌ ناقه‌ شنگالئ، دگه‌ل وان فه‌توایین وان کو دگوتن، ئیزدی کافرن، پا دئ چ ل مه‌ که‌ن؟! من ب پئیا ته‌له‌فزیونئ، بانگا هه‌فکاریئ کر. ئهم چ بکه‌ین، که‌سى ده‌نگئ مه‌ نه‌به‌یست، مه‌ نه‌شیا ده‌نگئ خوه‌ بده‌ینه‌ گوهدارى کرن. مه‌ دگوت 'هاواره' مه‌ بانگا هاریکاریئ دکر، لئ که‌سى گوه‌ نه‌دا ده‌نگئ مه‌، هه‌می که‌سى گوهداریا (پ. د. ک) کر. ئه‌وان ئاگه‌هیین ده‌رو و چه‌وت ددانه‌ جیهانئ. دگوتن، ئیمناهییا شنگالئ پاراستیه و ئهم ل شنگالئ نه‌ و دئى بپاریزن، مه‌ پیدفئى ب چ تشته‌کی نینه‌؛ هه‌رچه‌ندی مه‌ بانگا هاریکاریئ دکر و مه‌ دخازت فئى مه‌ترسیئ ب ده‌نگه‌کئ بلند بقپیرین و بیژین ژى، ئه‌وان دگوتن، 'شنگال د ئیمناهیئ دایه و چ تشته‌ک پیدفئى ناکه‌ت'. بۆچئ؟ ژ به‌ر کو وان به‌رى فه‌رمانئ پیلانئین خوه‌ دانابوون. ل ئوردنئ، دگه‌ل قه‌ته‌رئ روونشت بوون، پیلانئین خوه‌ دارژتبوون. (پ. د. ک) دگه‌ل وان هه‌فکاری کر بوو. ئهم نه‌شین بیژن هه‌می پیشمه‌رگه‌ بئى که‌رامه‌ت و ژ ترسان شه‌ر نه‌کرن. نه‌خیر، نه‌ وه‌سایه، بابه‌ت جو‌دایه. گه‌ر بریارا پاراستنا شنگالئ هه‌با، ب باوه‌ریا من، دا پیشمه‌رگه‌ ژى شه‌پى که‌ت. لئ بابه‌ت نه‌ وه‌سا بوو. نه‌ ژ به‌ر ترسئ په‌قیان. ئه‌ف بریاره‌ ژ ریفه‌به‌ریا (پ. د. ک) هاتبوو دان. ژ بلى مه‌سعود بارزانى، نه‌ وه‌زیرئ پیشمه‌رگه‌ نه‌ ژى وه‌زیره‌کئ دى نه‌دشیا فئى بریارئ بده‌ت.

بریارا پاشفه‌کیشه‌ئ، ل گۆرى پیکهاتئین مه‌سعود بارزانى دگه‌ل وان پیکهات. پیشمه‌رگا ل هه‌مه‌به‌ر داعشئ شه‌ر نه‌کر. ژ خوه‌ داعشئ د سه‌رى دا ب هیزه‌کا نه‌ وه‌سا مه‌زن هیئرش کر بوو. ئه‌ز فئى ژى بیژم؛ وئ شه‌فئ، که‌سه‌ک ژ مه‌ نه‌پازابوو، ئهم هه‌می هشیار مابوین. ل گوندى مه‌، ل ژیه‌لى زۆمانئ گره‌ک هه‌بوو، ئهم هه‌می ل سه‌رئ وى گرى بوین و هه‌تا به‌رئ سپیدئ ژى ئهم نه‌پازابوین، مه‌ ل سه‌ر وى گرى، ئۆتومبیلئین داعشئ ددیتن. ل شنگالئ، بتنى هیئزا پیشمه‌رگه‌یان هه‌بوو، لئ شه‌ر نه‌کرن، ژ خوه‌ بریار ژى نه‌بوو شه‌پى بکه‌ن. د باوه‌رى و ئولئ ئیزدیان دا

نه پرهفين، وان ب بهرخوه دانى، شهر كرن. گه لهك گوندى هاتنه كوشتن، لى ديسا نه پرهفين و گوندى خواه پاراستن. (پ. د. ك) رپيا گوندى ههمى گرتبوو. ههول ددان رپگرپى ل پهقا گه ل بكهن. گه ل هه ر ژ سه رى سپيدى، ده ست ب ته رك كرنا گوند و وارى خواه كربوون. مه بهرى هينگى چه ند بير ل قونتارا چيايى شنگالى فه كربوون. خه لك، ل نيزيكى وان بيرين ئافى، كوم ببون. دنيا زور گهرم بوو. هيزين (پ. د. ك) ده مئ سپيدى، بهرى خه لكى ده ست ب پهقى كربوون. وان تيك گوله ژى نه هافيت بوون. ئه ف فرمانه (پ. د. ك) به رى تيزديين شنگالى ئينابوو.

داعش كهفته نانا شنگالى

